


welat

Sal: 2 Hejmar: 90 7-13 Mijdar 1993 5000TL (KDVD) Rojnameya Hefteyî

Yılmaz Güney
li Îrane jî tê
sansurkirin

Rûpel 13




Gelê Kurd aştîyê dixwaze, dewlet jî şer pêşkêş dike

Pêşbaziya şer û aştîyê

Li Tirkiyeyê her ku şer ji aliyê dewletê ve tê diwartirkirin, hêviyên aştîyê jî zêde dibin û kesên ku di pirsgerêka Kurdî de çareserîya demokratîk diparêzin, her diçe dengê xwe bilindtir dikin. Dewlet li aliyekî gelê Kurd bi tevahî ji xwe re dike hedef, gund û navçeyan hildiweşîne û qetliaman pêk tîne, li aliyê din jî, bingeha van qetliaman di qanûnên xwe de ava dike û qanûnên ku hene li gorî rewşa nû û politikayên xwe yên faşîstî ji nû ve sererast dike.

Bi vê jî namîne di nav gelê Tirk de; li hember Kurdan tovê neyartiyê diçîne û gel ber bi şerê Kurdkujîyê ve bi rê dixê. Li metropolên Tirk tevgerên nijadperestî ji aliyê dewletê ve bi destekeke berbiçav tînin birêxistin û li hember Kurdên koçber tînin tûjkirin. Li gelek bajarên Tirkiyeyê û li hin bajarên Kurdistanê bûyerên ku ji aliyê hêzên nijadperest ve tînin pê, her diçe zêdetir dibin. Dewlet soz dide van tevgerên nijadperest ku, dê li hemûyan çek belav bike.

Rûpel 8



DI VÊ HEJMARÊ DE

Rêziman û rastnivîsa

Baran Rizgar Rûpel 10

Dilovaniya Apê Osman

Nazîf Nasro Rûpel 13

Zorevawanî keçan

Mam wisû Rûpel 11

Ji zaneyan re name

Seyîr Çiya Rûpel 13

Êdî zehf xwîn

Îzzet Gezgör Rûpel 9

Partî Karî Serbixweyî Kurdistan

Li Başûr partiyeke nû

Welat/ Zaxo- Li başûrê Kurdistanê partiyeke nû ya bi navê Partî Karî Serbixweyî Kurdistan hate avakirin.

Roja 22'yê Cotmehê li Hela Midya, li Hewlêrê ahenga destpêkirina kongreya damezrandina Partî Karî Serbixweyî Kurdistan hate girêdan.

171 endam û 17 çavdêr tê de hazir bûn. Piştî rêzgirtina şehîdên Kurdistanê Tîpa Mezopotamya Marşa Karkeran pêşkêş kir. Kongreya ku di 22'yê Cotmehê de dest pê kir, roja 27'yê mehê qediya.

Di encama Kongreyê de biryar hate hildan ku, navê xwe bikin Partiya Karî Serbixweyî Kurdistan.

Tê zanîn ku, komunîstên başûrê Kurdistanê di havîna 1993'yan de li Hewlêrê ji Hizba Suûyên Iraqê qetiyabûn û paşî ketibûn nav hewldana damezrandina partiyeke nû.

Ev rewşên birêxistinê komunîst ên ku Partî Karî Serbixweyî Kurdistan damezrandin, kovareke bi navê "Rizgarî" bi pêşkêşîya Ebû Hikmet, Refîk Sebir û Hasmî Koçanî derdixin.

Tevgera Heqe

Bizava Heqe tevgera olî û civakî ye ku di dawîya sala 1920'an de li başûrê Kurdistanê serê xwe hildaye. Hîmdarê vê tevgerê Şêx Evdilkerîmê Eskerî bû ku yek ji şêxên Terîqekta Nexşebendî ye.



Ziman û pêşveçûn

Niha dema fezayê ye, dibêjin. Temenê mirovahiye gihîşte 7 hezar salî. Dema pêşin, dema navîn, dema nû û dema nêz hatin û derbas bûn. Mirovahî zexim bû, ekonomî (aborî) bi pêşve çû, teknoloji gihîşte dema nû. Dewletên xwedî hêz û pêşveçûyî derketin holê. Li ser neteweyên paşvemaî zilm û zorê kirin. Ev yek heta niha jî didome. Lê, di nav neteweyên gerdûnê de, neteweyek bi tenê jî wek neteweya Kurd nepelçiqiye. Bi vê armancê me daxwaziya fêmkirinê, eziyet kişandina gel di girtîgehan de dikim. Armanca min paşvemaîna gelê Kurd jî hemû gelan pirtir e û li ber çavan e, dixwazim bînim ziman.

Di vê dema niha de pîremêr û pîrejînên giştî gelan xwedî xwendina nivî ne. Hinek zanîngehan xwendine, lê ciwanên wan bi pirrahi zanîngehan qedandine, bi vî awayî bûne mihendîs, doktor, dozger, dadger, mamoste, hiqûqnas. Hinek jî wan di komeleyan de lêkolînvanîyetiye dimeşînin. Ta bûne profesor.

Ka neteweya gelê Kurd? Ka zimanê Kurdî? Çand û huner ketiye ku derê? Doktorên Kurd,

mamoste, hiqûqnas, hunermend, dadger û mihendisên me ka nin? Çima profesoren me nîn in? Ma em jî ne mirov in? Ma dîroka me di dîroka gerdûnê de tune ye? Ma pêşiyên me çet dewlemendîti nekirine? Qenciya vî gelî negihîştîye tu kesî?

Bêguman, ev gel jî gelên din ne xwedî ferqeke mezintir be jî, ji hinek gelan serkeftîtir e. Em jî neteweyek in, xwedî dîrok, çand, huner, ziman û welat in. Lê hema em bi zimanê xwe, çand, huner, dîrok û hwd. bindest in. Zimanê me qedexe ye. Dîroka me veşarî ye. War û welatê me talankirî ye. Em bi darê zorê di dema ewil de mane. Nahêlin em bi pêş ve bimeşin. Nahêlin em bikenin, vexwin û bixwin. Bi kurtahî me bi qirkirin û jenosîdê bindest dikin. Ên ku nizanin, bila bizanibin. Ên dizanin bila şiyar bibin. Ên şiyar bûne jî ranewestin.

Xweziya min bi çavê xwe serxwebûn û azadiya Kurd û Kurdistanê bidîta. Bila êdî Rebê alemê hemû hebûnên min bida xizanên neteweya min.

Hîvvan Yekta/ Diyarbekir

Kalikê min Kurd e

Yeke kurd li taksîmê li McDonaldsê [celebek resturant] rûniştibû û rojnameya xwe ya Kurdî dixwind hevaleke wî hat ser tawla ((masa) wî û hema jî nîska ve rojnameya wî ji destê kişand û dest bi xwindina Kurdî kir wek bilbil dixwind. Hevalê wî jî, xwe re şaş bû û mat ma lê çewa yekê Tirk wisa delal Kurdî dizane? Tu kurdî jî kur dizanî min heta vêga Te wek Tirk dizanibû bibexş, hevalê wî bi aweke pezininandanî bersîva wî da.

Yawo Kalikê min Kurd e û bi eslê xwe jî, me ji Adiyamanê ne, çî xebera Te ji vê dinê heye?

xortê kurd jî bi aweke xezeb bersîva wî da, welle me dizanibû ku Adiyamî warê Kurdan e lê, me nizanibû ku li wir xwe nas hene.

—yawo Tu çî dibêji? Kalikê min tim jî me re tim basa şerê ku bi Frasiyan re kiriye dikir ku wana jî warê xwe ajotine, çavê xwe veke çavê min, hişê Te li serê Te ye?

Belê hişê min li serê min e lê hişê min vî tiştê nagire ku meriv ji Kalikê xwe heta xwe, xwe nasnake. Belkî Babê te jî Erebe yan jî her keşek ku esleke wî heye di malbata we de. Bi van gotinan zilamo zaf aciz bû dikir ku di nava xwe bifetîsiya lê mixabin tu bersiv ji wî re tine bû ku bersiv bida û, ji bo ku serê xwe û, xwe bixwe ne êşîne bersîveke zaf tewş nerm da.

yawo, ev hezar salin ku em bi hev re dijîn û ez dibêim wisa bêhtir e rêya Kemo baştir e.

Hevalê kurd hew êdî hedan kir û bersîva wî da. Madem hew çend Tu ji Kemo û rêya Kemo hisdikî, behre Kalikê Te Kemo be ne Kurd be

.S.S.Dilpolo.

Waney gerîla

Ey xelkîne!
Xolî jêr pêy gerîlakan
bikene "Mayelûs" û der
man

Wek û dermanî çawêşe
le çawî xotanî biken
Araqey baxelî çekdar
Kîçe nazderekani Şar
bikene naw şûşey gulaw
wek bon le xotanî biden
Qijî xwotanî pê mêş ken
Daykî şehîd dezgiranî
Zawa le azarda kujraw...!
Be xwênî şehîdanî Kurd
Xenebandanî azadî û
Nemanî faşiyê pê biken
Minalan û şagirdanî
qûtabxane

Waney Şorişî azaiyî
le gerîlakanewe fêrbin
Caw le şehîdantan biken!
Rûyî bêgerd û befrînyan
Wek û kifin le ber biken
Wanekanî Serok Apo...
Wek û ayet le ber biken!

*Wane: Deris
Xol: Ax
Muhammed Amîn Pêncwênî

Azarî 1991/ Hewlêr

Nahêlin rojname bên firotin

Merheba hevalên hêja, xebatkarên rojnameya Welat!

Hêvîdar im ku hûn bi xweşî, şadî bijîn û her wext nîştimanperwerên we û me di nav gel de hebin.

Li Amedê dijmin har bûye

û bi kuçeyan ketiye. Mirovên bê sûc û qebahet bi kêr û qasetoran dikujin. Sûcê wan ew e ku Özgür Gündem'ê difiroşin. Dijminê kedxwar, xwînmij ji çavsoyîya xwe nahêlin rojnameya Özgür

Gündem"ê bê firotin. Dibêjin ku, gere hûn rojnameyên din ên bi vî rengî jî nefiroşin, bila ew werin rojnameyên xwe bifiroşin.

Ez bawer im ku gelê me dê, li rojnameya xwe xwedî derkeve û bistîne, bixwîne û bide xwendin. Keç û xort divê em gotina şehîdê nemir, Apê Mûsa ji bîr nekin ku gotibû: "Gere em kêfa Özal li xwe neynin". Özal gotibû niha em rojnameya bi Kurdî serbest bikin jî, piştî bi demekê dê dev jê berdin û dîsa bi Tirkî binivîsînin û bixwînin. Divê em bi dil û can li Welat xwedî derkevin. Bikirin, bixwînin û bidine xwendin.

Ji Amedê silavên şoresgerî ji we nivîskar û xwendevanên Welat re.

Rengîn Ronahî/ Amed

Nivîsara Welat

Divê ev war jî xurt bibe

Ji bo serkeftinê pêşveçûyîneke komplet pêwist e. Dema di warekî tenê de jî kêmasiyên mezin hebin, di pêvajoya dirêj de warên din ên pêşketî jî dikevin tengasiyê û rê li ber serkeftinê tê girtin. Ji ber yê yekê pêdivî ye ku mirov hiş û giraniya xwe êdî zehf bide ser warên pêşneketî. Mixabin, rojnamegeriya Kurdan yek ji wan warên li paş mayî ye. Em xwedî îdîa ne ku bi rojnameya Welat em vî warî derxînin rastê.

Rojnameyêke ji her aliyî ve bedewtir û biqalîtetir hedefeke najêger e li pêşiya me. Pêkanîna rojnameyêke ku em difikirin wê di demeke nêzik de were cih. Wela-teke 24 rûpel û rengîn.

Ji mijarên siyasî bigirin ta mijara sporê, di rojnameya me de dîsa bi zimanê me yê zikmakî wê werin honandin.

Plan û projeyên ku me danîne ber xwe bi ihtimaleke mezin wê di destpêka sala 1994'an de bînin pêkanîn. Bi rastî em bi derengiyê ketine di guhertinan de, bes li

Ji bo serkeftinê pêşveçûyîneke komplet pêwist e. Dema di warekî tenê de jî kêmasiyên mezin hebin, di pêvajoya dirêj de warên din ên pêşketî jî dikevin tengasiyê û rê li ber serkeftinê tê girtin. Ji ber yê yekê pêdivî ye ku mirov hiş û giraniya xwe êdî zehf bide ser warên pêşneketî. Mixabin, rojnamegeriya Kurdan yek ji wan warên li paş mayî ye. Em xwedî îdîa ne ku bi rojnameya Welat em vî warî derxînin rastê.

pêşiya me tengasiyên pîrr dijwar hebûn û hene, lê tevî vê yekê em xwe mecbûr dibînin ku hemû pisgirêkan, bi têkoşîneke bêrawestî ji ber xwe hildin û rojnameyêke tatmînkar pêşkeşî xwendevanên xwe bikin.

Ji bo weşandina rojnameyêke 24 rûpel a bi zimanê Kurdî pêwistî bi kadroyeke xurt û gihîştî

heye. Ev zêdeyî salek e ku em di nav hewldana gihîştandina kesên ku dikarin bi zimanê Kurdî rojnamevanîyê bikin, de ne. Bi rastî hê jî di vê helê de zêde rojnamevanên gihîştî tunin. Bes em baş dizanin ku em di vî warî de, hîna di destpêka rê de ne û ji bo destpêka karekî em xwe kafî dibînin. Tu dibistan û akademiyên me tunin ji bo gihîştandina rojnamevanan. Lê em bawer dikin ku kesên di nav pratîka rojnameya Kurdî de digihîjin ji yên akademîyan zûtir û baştir vî karî fêr dibin. Ji ber ku em mecbûr in vî karî jî hemû kesan çêtir û zûtir hîn bibin.

Di heftiyên pêşiya me de em ê li ser Welateke 24 rûpel û rengîn binivîsin, naveroka ku em ji bo rojnameya nû difikirin pêşkeşî we bikin û li benda dîtî û nixandînen we rawestînin.

LI ME BIBORIN

Di hejmarê Welat a dawî de sitûnek nivîs di rûpela 16'an de berevajî derket. Ji ber nezanîna tîpên Erebi hevalên me yên li karê çapxanê dinêrin ev çewtiya mezin nedîtî. Em ji xwendevanên xwe hweviya lêbêrînen dikin.

Ferhengok

Arîşe: Gels, gelemşe, problem

Lêder: Kesê ku li tiştêkî dide, wek saz, tembûr û hwd.

Bîner: Dîdevan, çavdêr

Yaxî: Serhildêr

Balinde: Teyr û tilûr

Karsaz: Xwedî karistan, xwedî kar (îş adami)

Kardêr: Patron

Hawîrkan: Pêzbazî (Misebeqe)

Siza: Ceza

Penahende: Penaber

Kewşen: Sinor

Naştin: Definkirin

Pole: Tewşîk, (aşiri)

Rehilî: Lerizîn

Rêje: Proporsiyon

Tek: Aksiyon

Ber-Tek: Reaksiyon

DÎLAN

Keça me Tirkan û lawê me Evdile roja 10'ê Mijdara 1993'yan li Îdirê bi dîlaneke rengîn dizewicin.

Em hêvîdikin ku ev zewaca wan ji berê zêdetir bi welatê wan ve girêbi de.

Bavê keçikî
Habîb Alkoç

Bavê lawik
Kadir Alkoç

.....NÛÇEYÊN CENGÊ.....

Hovitiya dewletê didome...

Ê rîşên gerîla her diçe xurt dibin. Gerîlayên ARGK'ê li her deverên Kurdistanê hebûna xwe û şerê xwe dane naskirinê. Vê hefteyê jî giraniya xwe dane ser hemû deverên Kurdistanê, her wekî herêmên Dêrsim, Elezîz, Çepekcûr, Erzirom û hwd. di bin bandora livbaziyan gerîlayan de mane. Ev rewş jî dide xuyan ku gerîla li her derê Kurdistanê şer dike.

Li ser xurtbûna livbaziyan ARGK'ê hêzên dewletê li Kurdistanê dest bi qetbirran kirin. Li Licê û bi sedan gundên herêmê hilweşandin. Gelek însan kuştin gelek jî xistin bin çav.

28 Cotmeh 1993: Hêzên dewletê li çiyayên Çemçê ku di navbera herêmên Qers, Agirî û Erzeromê de ye operasyonêke dorfireh pêkanîn. Ji gundên navçeya Qaxizmanê 90 kes ji aliyên dewletê ve hatine girtin.

Gerîlayên ARGK'ê li Mûşê li navçeya Kopê li gundê Rustemgedikê êrîş birin ser qehwexaneyekê û şewitandin.

Li Erziromê li navçeya Şenkayayê gerîlayan avahiyên fermî û dibistanek şewitandin.

Hin kesên nenas, avahiyên Belediyeya Cizîrê dane ber guleyan. Ekîba agirkuj ya belediyeyê ji bo vemirandinê hate cihên bûyerê. Lê ew ji aliyê hêzên dewletê ve hatine girtin. Di navçeya Cizîrê de li hinek taxan operasyon pêk hatin, 10 kes girtin.

Panzereke leşkeran li ser riya Cizîr û Silopiyê li mayînê ya ku ji aliyên gerîlayan ve hatibû danîn qelibîn 3 leşker mirin, 4 leşker jî birîndar bûn.

Hêzên dewletê li Şirnexê li navçeya Silopiyê Taxa Cûdiyê êrîş birin ser malekê. Di navbera wan û xwediya malê de şer derket. Lê kuştî û birîndar çênebûn. Di bûyerê de 4 dezgehên kar, texsiyek û 3 kamyon şewitîn.

Li Dêrsimê li navçeya Xozadê li herêmên li dora gundê Alibaxê, ji aliyê hêzên dewletê ve tê bombekirin. Di bûyerê de 2 leşker hatin kuştin.

Di navbera timên taybetî û gerîlayên ARGK'ê de li



Kalepîrên Kurd dîsa li ser riya koçê li dîroka borî difikirin

Dêrsimê li navçeya Malkîşê (Çemişgezek) şer derket, 3 tîm hatin kuştin.

Gerîlayên ARGK'ê êrîş birin ser navçeya Şirnexê Elkê (Bêşebabê), li Silopiya Şirnexê jî hêzên dewletê jê 2 zarok 3 kes kuştin.

29 Cotmeh 1993: Hêzên dewletê êrîş birin ser navçeya Şirnexê Cizîrê, her der dane ber gulebaranê. Di êrîşê de dezgehê xesirî, 4 dezgeh jî bi nivî hatin xesirandin.

Di navbera cerdevan û gerîlayên ARGK'ê de li Qersê li navçeya Sariqamîşê li gundê Belencikê şer derket. Di bûyerê de 4 cerdevan û 3 gerîla hatin kuştin.

Gerîlayên ARGK'ê li Agiriyê li herêmên gundê Patnosê 4 dibistan şewitandin. Li Erziromê li navçeya Çadê, li Saltasê gerîla avête ser malekê û şewitandin. Li Batmanê jî aliyên hin kesan ve bi navê Emrullah Ant mirovek hate kuştin.

30 Cotmeh 1993: Li Amedê li navçeya Erxenyê gerîlayên ARGK'ê 5 dibistan şewitandin.

Gerîlayên ARGK'ê avêtine ser Şirnexê, bi çekên durravêj ve Emniyeta Şirnexê, dezgeh û avahiyên rê hatine xesirandin.

31 Cotmeh: Gundê Çiçeklî ku li ser navçeya Erziromê Hesênkelehê (Pasînlê) ye 7 kes hatine kuştin. Li gora agahiyên fermî, bûyer jî aliyê gerîlayên ARGK'ê ve hatiye kirin. Li ser vê bûyerê bi pêşengiya faşîstên ji partiya MHP'ê, li Erziromê çend hezar kes li dijî PKK'ê meşyan.

Di navbera cerdevanan û gerîlayan de li Sêrtê li navçeya Kufrayê (Şirwan) nêzikî gundê Ormanbaxê şer derket. Cerdevanek mir, 2 cerdevan jî birîndar bûn. Li Culemêrgê gerîlayan rê birrî,

10 cerdevan revandin.

1 Mijdar 1993: Hêzên dewletê li Mêrdînê 7 gund û 10 zozan şewitandin. Li Bismila Amedê jî êrîş birin ser gundê Çavuşoğlu, 45 mal hilweşandin.

Li Culemêrgê hêzên dewletê operasyonêke dorfireh pêk anî, bi tanq û topan ve êrîş birin ser bajêr û gelek cih xesirandin.

Gerîlayên ARGK'ê cerdî ser tûgaya Dêrsimê kirin, di navbera hêzên dewletê û gerîlayan de şer derket kuştî û birîndar çênebûn

2 Mijdar 1993: Gundê Pareza ku li ser Bilîsê Motkayê ye, ji aliyên hêzên dewletê ve hate şewitandin.

Li Mûşê li navçeya Melazgirê li herêma gundê Yaramîşê, gerîlayên ARGK'ê nasname kontrol kirin. Di navbera hêzên dewletê û gerîlayan de şer qewimî. Piştî bûyerê hêzên dewletê cerdî ser gundê Yaramîşê kirin û 31 gundî xistin bin çav.

Gerîlayên ARGK'ê li Amedê riya Gelê birrîn û kontrola nasnameyan kirin û erebeyekê Belediyeya Pîranê (Dicle) şewitandin. Cerdevanek jî ji aliyên gerîlayan ve hate birîndarkirin. Gerîla avête ser gundê Suluklu ku li ser navenda Ruhayê ye, derbarê kuştî û birîndaran de tu agahî nîn e. Ew mala ku gerîla cerdî ser kiriyê mala mixtarê gund e.

3 Mijdar 1993: Hêzên dewletê êrîş birin ser navçeya Culemêrgê Çelê, her der dane ber gulebaran. Kuştî û birîndar çênebûn, lê 80 mal xesirîn. Gelê Çelê li ser van êrîşên dewletê ji navçeyê koç dike.

Cerdevanên gundê Deştanê, ku li ser navçeya Çelê ye, çek danîn. 90 cerdevanan çekên xwe dane tabûra "Üzümlü" yê û koçî Culemêrgê kirin.

HAWAR

Dilbixwîn

Siwarê hespê azadiyê
Osman Sebrî (1)

Nûçeyekê xemgîn e. Zimanê min nagere ez ji we re wê nûçeya reş bixwînim, biborînin. Mercên felsefeya jiyane hene. Jiyan weke ku tê, diçe jî. Hatî hebe çûyî jî heye. Hatî bêyî çûyî nabe. Wisa jî mirin û jiyane hev û din temam dike. Lewre ezê li vir jî we re bibêjim. Tu caran jî mirinê re serê xwe netewand, jê netirsiya, ji ber nereviya û her demê sînga wî ji berxwedanê re vekirî bû. Lewma jî bi serbilindî û şerefeke mezir, roja 12'ê Cotmeha 1993'yan hozan û serhildêrê cihbilind Osman Sebrî (APO) hêdî hêdî çavên xwe dane ser hev, koça xwe bar kir û bêyî ku dilê wî bixwaze piştî xwe da heval, hogir û vê dinyaya bêçare. Em nikarin bi nivîs û pênuşa nivîskaran APO nas bikin. Em nikarin wî tenê di rojname, pirtûk û kovaran de bibînin û dîroka di dilê wî de bixwînin.

Tu caran berxwedana Apê Osman, li hember zilm û xiyaneperestiyê, bi gotaran şirove nabin. Tu caran meşa wî ya dirêj zor û zehmetiya li ber deriyê girtîgeh û zindanan, dijwariya surgûnî, sêwitî, êş û nalîna biyaniyê ya di kezeba Apo de, bi vê xameya di nava tiliyên min de nayê ziman.

Eger em bixwazin hozanvanê xwe yê nemir nasbikin, divê berî her tiştî em ji diwarên zindanan, qêrîn û hawara jinan, ji hovitiya gardiyanan û ji odayên mirinê, ji surgun û derderiyê bipirsin Osman Sebrî kî ye. Ne tenê hozanvan û nivîskarek bû, wisa jî Apo ji bo gelê xwe, berxwedana, şoreşger û siyasetvanekî şareza bû. Heya 12'ê Cotmeha 93'yan, ew, 88 salên xwe yê raperîn û meraniyê dadigire.

ji hovitiya gardiyanan û ji odayên mirinê, ji surgun û derderiyê bipirsin Osman Sebrî kî ye. Ne tenê hozan û nivîskarek bû, wisa jî Apo ji bo gelê xwe, berxwedana, şoreşger û siyasetvanekî şareza bû. Roja ku bavê wî diçe ser dilovaniya xwe û heya 12'ê Cotmeha 93'yan, ew, 88 salên xwe yê raperîn û meraniyê dadigire.

Ew di zikê diya xwe de siwar û serbazekî azadiyê bû. Lewre ji nivîskarekî bêhtir her kes Apo weke şoreşger û raperîvanekî neteweyî dinase. Belê, di 1905'an de hate dinyayê û 1993'yan de jî çû ser dilovaniya xwe. Di navbera her du mêjûyan de 88 sal hene. Ji bo Kurdekî 88 sal ne gelek in, pirranî gundiyan Kurdistanê 88 salên xwe diqedînin. Lê hema ne weke qedandina Apê Osman. Di heştê û heşt salên Apo de, tu caran rehetî, vehisandin, ken û şahî nehatin dîtin. Di heştê û heşt salên Osman Sebrî de, girtin, kuştin, xwêdan, xwînrijandin, qirkirin, surgûnî û koçî hebûn. Em çî navî li Apo bikin? Mêrê rojên teng û giran, nivîskarekî zindanan, hozanê azadiyê, yan jî kalê berxwedanê?

Apo layiqî her navekî şîrîn û ciwan e. Nemir Kemal Pîr di axaftineke xwe de, dema ku li Zindana Amedê girtibû, wiha digot: "Şoreşger ew kes e ku berî her kesî li ber xwe dide, berî her kesî jî şehîd dikeve. Lewre dema ku mirinek hebe, ez li pêşiya tevan im, dema ku berxwedanek jî hebe ezê nehêlim ku kesek di pêşiya min de li ber xwe bide."

Apo jî şoreşgerê wisa bû. Berî her kesî îşence didit û jî her kesî bêhtir jî li ber xwe dida. Kurdayetiya xwe bi vê berxwedana bi rûmet diparast. Ew welatparêz hate dinyayê, welatparêz jî çû. Xwezî bi wî kesî ku wiha rûmetdar were û biçê, fena Osman Sebrî layiqî her giranbuhabûneke neteweyî be.

Întîfada ya Cihûyan


Peymana ku, di navber a Îsraîl û RRF'ê de bi çavdêriya pêşengê Pergala Nû DYA'yê, hate îmzekirin, bi rêk û pêk nameşe. Ji aliyekî azadîxwazên Filîstînî ji bo domandina şer di hewldanên nû de ne. Li aliyê din kevineperest û nijadperestên Cihû rê nadin ku hinek gav bèn avêtin.

Nûçeyên Derve- Roja 29'ê Cotmehê mirovekî Cihû li şerfaya Rojava (West Bank) dema ku çû taxa Filîstîniyan ku hêkên erzan bikirre, ji aliyê endamên Hamasê ve hate kuştin. Piştî vê yekê Cihûyan li Şerfaya Rojava û Gazeyê serî rakirin. Li hember politîkayên Îzaq Rabîn derketin û êrîş birin ser avahiyan Ereban. Roja 31'ê wan êrîş birin ser kampekî penaberî ku Filîstînî tê de diman. Camên hinek malan bi keviran sikandin. Piştî re jî dibistanek şewitandin. Lê tiştêk bi tu kesî nehat.

Roja 1'ê Mijdarê Cihûyên aşînexwaz rê birrîn, nehiş-

tin Filîstînî biçin karên xwe û ji bo 2 saet û nîvan rê dagir kirin. Wan kesên ku ev tişt pêk anîn navê "Întîfada ya Cihûyan" li vê tevgera xwe kirin. Li aliyê din hevdiştinên di navbera nûnêrên dewleta Îsraîl û yên RRF'ê (Rexistina Rizgariya Filîstînê) de jî li bajarê Misirê, li Taba didomin. Piştî gelek guftûgotan li ser hinek mijaran, hêdî hêdî be jî digihîjin encamê. Heftiyê çûyî wek berhemê van civînan Îsraîlê 700 girtiyên Filîstînî ku, di zindanê de bûn berdan. Pirrên van kesên ku diwar nivîsandine, kevir avitine polîsan in. Ji van 7 kesên kalên 50 salî, 44 kes jî mirovên nexweş in.

Nûnêrên RRF'ê dixwazin ku heta 13'ê Kanûnê hemû girtiyên Filîstînî bèn berdan. Hejmara wan nêzî 13 hezaran e. Jixwe daxwaza gelê Filîstînî jî ev e. Dibêjin: "Divê mirovên ku Îsraîlî kuştine jî tê de, hemû kesên Filîstînî ku di girtgehên Îsraîl de ne, bèn berdan. Dîsa dibêjin: "Ji ber ku wan jî gelek mirovên me kuştine û hemû Filîstîniyên girtî jî bo azadiya gel kar kirine." Ev tişt pêwîst e. Lê Îsraîl vê yekê napejiñne û naxweze kesên ku, mirov kuştine nameze jî şerkarên Hamasê bèn berdan. Di eynî civînan de, li ser nexweyê cihê ku jê leşkerên Îsraîl divê vekîşin jî



Piştî libevkîrinên ku li bajarê Misrê, li Tabayê pêk hatin. Îsraîl 700 girtiyên Filîstînî berdan

hate tesbîtkirin. Jixwe di bû. Di 1'ê Mijdarê de li ser peymane aştîyê de ev tişt vê mijarê gihîştin encamekê. hebû, bes sînorê cihên ku, Divê vekîşana leşkerên Îsraîlîyan jî heta 13'ê Kanûnê ser rêvebiriya xweser a Filîstîniyan ava bibe, kifş nebû- pêk were.

Dengê têkoşîna PKK'ê di çapemeniya Ereba de

Heftêsalîya Tirkiyeya xort

Doh Tirkiyeyê cejnêk jî bo boriya heftêsalî ya Komara Atatürk çekir. Çend roj berî cejnê Serokkomar Süleyman Demirel jî bo hişbûn (sikût) ê gazî hemwelatîyên xwe dikir û digot: "Ev tişt tirsê naxwaze. Ev nerihetîyeke rêwî ye û dibore." Helbet Süleyman Demirel îşaret li terkên ku ji nişkav ve di Komara Mustafa Kemal de, çêbûye dikir. Ev mirovê ku, nexweşîna Împeratoriya Osmanî kurt kir, da ser hev û dewletek damezrand ku, tê de ew hindikahiyên etnîkî nîn bûn. Ewên ku berê di Împeratoriya Mezin a Osmanî ya rojhilat û rojavayê Bosforisê (tengav) de hebûn. Demirel dixwest zerengîya (kapasîteya) vê "nerihetîya rêwî" ku, partiya sosyalîstî ya Kurdî peyde kirîye kêmbike. Lê Serokwezîra wî Çillerê tu car nexwestîye ew tengasiya ku Tirkiye hem li derve û hem jî li hundir tê de dixeniqe, kêmbide nişan.

Belgeya herî berbiçav jî bo tirsê Tirkiyeyê ew e ku, piştî rexnekirinên li hikûmetê ya der barê çareserkirina pîrsgirêka cudaxwaz a li başûrê welêt, di 24'ê mehê de wezîrê hundirîn û parêzîyê, jî kar hatin xistin.

Belgeya din jî qerarê Lijneya Ewlekariyê ya Neteweyî ye ku li Tirkiyeyê bilindtirîn desthilata siyasî ye, ya jî bo dirêjkirina Rêveberiya Taybetî li deverên Kurd lê dijin.

Ev tişt gişt piştî kuştina generalekî Tirk ku li bajarê Diyarbekirê bi destê Partiya Karkerên Kurdistanê hatibû kuştin, pêk hatin. Ev general jî, ji sala 1984'an ta bi wir ve yê herî mezin e ku di şerê li dijî PKK'ê de hatiye kuştin. Wisa dixuye ku Tirkiye bi carekê li dijî desthilata partiya Kurdî ye, ku di Başûrê Rojhilat de dixebite û bûye dewletek di nav dilê dewletê de. Ew parti deriyê rojname û partiyan digire û hin car jî dibistan tèn şewitandin, mamoste tèn kuştin bi hinceta ku jî bo dewletê dixebitin.

Têkiliyên Tirkiyeyê yên bi hemû cîranên wê re, jî yên hundirîn xerabtir in. Piraniya gelê Tirk bersiva ka bi çî awayî partiya Kurd ewqas mezin bûye dixwazin ku jî çend sedî bûye 15 hezar.

سبعون تركيا الفتاة

تقلبت تركيا اسم سرور سبعين عاما على جمهورية كمال اتاتورك وبقيت ايام من الاحتفال كان الرئيس سليمان دميريل يدعو مواطنيه الى اليهود، ولا سبب للظوف، انه مورد ازواج عابرين ووسطي.

كان سليمان دميريل يتنهد، فطعا، الى هذا الشرح القاسي في جمهورية مصطفى كمال، الرجل الذي اختصر الامبراطورية العثمانية الرهيبة وكم الطراها، من اجل انشاء دولة لا تخضع للاحتلال والاشغال والامبراطورية التي كانت تخضعوا لله الامبراطورية العثمانية عبر التاريخ.

فوقه، وهو اعلى حبة سياسية في البلاد، بتسند فترة الاحتكام العرف في مناطق الكثافة التركية.

كل هذا جرى بعد اقدام حزب العمال الكردستاني قبل اسبوعين على اغتيال قائد الدرك في ديار بكر، وهو ارفع مسؤول سياسي في المنطقة، من الحرب منذ ان شن حملة التمرد في العام 1984، ويبدو وكأن تركيا افتتحت مرة واحدة على مدى المسئلة التي اخذت يتسحق بها الحزب الكردي في الجيوب الضيقة حيث تسيطر الى دولة في قلب الدولة، يطلق الضممة والانحياز، واحيانا هناك من يصرق المدارس ويقتل المعلمين لجرد انه


Hikûmeta Tirk di roja sêşema borî de bi daxuyaneke fermî cîranên xwe sêbar kirin; wek Sûriye, Iraq û Ermenîstanê ku alîariya Kurdan dikin. Tiştê balkêş ew bû ku, Îran nehate sêbar kirin, di gel ku pêwendiyên di navbera Enqere û Tehranê de nazik in.

Li gorî diyariyên Tansu Çillerê wisa dixuye ku, şerê li hemberî partiya Kurdî bêhtir berfireh dibe. Çillerê gote ku 120 hezar leşkerê nîzamî, 15 hezar polis û 30 hezar cerdevan di "êrîşeke ta dawî" de li dijî Partiya Karkerên Kurdistanê tedişikîn.

Rojnameyên Tirkî gava ku behsa partiya Kurdistanî û xebatên wê dikin, tebîrên tûj û biyanî kar tînin. Ev nakokî gihîyan radeyeke wisa ku, êdî 17 parlamentêrên Kurd di parlamentoyê de jî xwe re di quncikekî de rûdin û yên din nêzîkî wan nabin, wan wek alîgirên PKK'ê dibînin. Leyla Zana tê darizandin (mehkemekirin) jî ber ku, li parlamentoyê bi Kurdî peyiviye.

Terk zêdetir fireh dibe. Rêveberiya Taybetî ne çareserî li pîrsgirêka Kurdî û ne jî li desthilata navendî dike. Îstikrara li Tirkiyeyê jî bo gişt welatên derve girîng e û Amerîka jî her kesî bêhtir li serê disekine. Radyoya Dengê Amerîkayê di bernameyêke ku siyasata fermî (resmî) ya Amerîkayê dide kifşkirin de, got ku: "pêwendîya herdu welatan girîng e ku, Atatürk jî beriya bi 70 salan wisa li serê biryar daye."

Nîşe: Ev nivîsa Semir Etelleh ji rojnameya ASHARQ AL-AWSAT, ji hejmara 5451'î ya 31.10.1993'yan hatiye standin û ji hêla Welat ve li Kurmancî hatiye wergerandin.



Salvegera Şoreşa Cotmehê

Nûçeyên Derve- Li Moskovayê pîrozkirina salvegera Şoreşa Cotmehê ya 76'an hate qedexekirin. Li gorî biryarnamê Serokê Belediyeya Moskovayê, serilêdane hinek partiyan (Partiya Komunîst, Partiya Demokrat a Xiristîyan hwd.) jî bo pîrozkirina salvegera şoreşê hate redandin.

Desthilatdarên Rusyayê jî bo vê yekê jî qedexeya ku Wezereta Dadiyê ku piştî bûyerên 3'yê Cotmehê danibûn ser xebatên van partiyan, nişan didin. Ji bo berlêgirtina hinek livbaziyan ku ev hevî dikin de di vê rojê de pêk werin, giraniyê didin ser xebatên "ewlekariyê". Wan dil heyê ku dîsa xwîna gelê azadîxwaz û kedkar birijînin. Li gorî salnameya Rusî mêjûya ku, şoreş çêbûye 23'yê Cotmehê ye. Lê ev roj li

gorî salnameya Miladî 7'ê Mijdarê ye.

Li aliyê din rojnameya Pravda roja 1'ê Mijdarê, piştî ku mehekê qedexa ma, dest bi weşanê kir. "Çar Boris" piştî qirkirina xwe ya 3'yê Cotmehê di gel hinek partiyan, çapemeniya dijberê xwe jî qedexa kiribû. Pêşî got: "Bila ev rojname hem navê xwe, hem jî rêveberê weşanê yê giştî biguherin." Lê piştî re got: "Bes bila rêveberê weşanê yê giştî biguherin." Berpiryarên rojnameyê ev daxwaz anîn cih û dest bi weşanê kirin. Wek tê zanîn ev rojname weşana navendî ya Partiya Komunîst a yekitiya Sovyetê bû. Di sernivîsa rojnameyê de tî gotin ku, ew tu car dev jî doza sosyalîstîyê bernadin û de hemû hêjayiyên sosyalîzmê biparêzin.

Pêşniyara Qanûnê Terorê ya nû

‘Qirkirina gelê Kurd qanûnî ye!’

Navenda Nuçeyan- Şerê li Kurdistanê hemû riyên li ber dewletê digire. Ji ber ku hêzên dewletê li hemberî şerê gelê Kurd di tengasiyê mezin de ne dev ji hemû formalîteyên demokrasiyê berdidin. Êdî qanûnê terorê ya kevin bi kêrî wan nayê, ji lew re pêşniyara qanûneke nû bi destê Wezareta Hundirîn hate amadekirin û dixwazin bi lez û bez têxin rojevê. Li gor vê pêşniyarê çarçoveya terorê fi-rehtir dibe. Piştî ku ev pêşniyar bibe qanûn, hemû mirovên azadîxwaz dibin terorîst. Bi vî qanûnî pest û pêkûtiyên li ser gel û mirovên pêşverû dibin qanûnî. Lê hemû saziyên demokratîk û livbaziyên mafxwaz qedexeyê dibin. Dîsa bi vî qanûnî qirkirina gelê Kurd dibe tiştê qanûnî, ji ber ku ev qanûn hemû mirovên azadîxwaz wek terorîst dinirxîne.

Li aliyê din saziyên ku heta niha bi awayekî raste rast ne di bin xizmeta şerê qirêjî de bûn, dikevin bin xizmeta şer. Saziyên wek bançe, şirket û hwd. bi awayekî raste rast dibin jêdera diravî ji bo şerê qirêjî. Dewlet dê gelek fonên ku li ser navên cihêreng hatibûn avakirin ji, ji bo vê yekê bi kar tîne. Ser de ji peryên ku ji listikên şans (toto, loto, millî piyango, pêşbaziya hespan û hwd.) û hemû pêşbaziyên sporê qezenc dikir ji, hinek peryan ji bo "fona terorê" bi kar bîne.

Di vir de mirov tediqihîje ku biryara qedexekirina hinek xwiye pîs wek, qumar, mey-vexwarin hwd, çiqas di cih de ne. Divê gelê Kurd û kedkarên Tirk ji îro pe ve hinek tiştên din wek çuyîna macê, standina bilêta piyangoyê, listina toto, loto û tiştên ji bo xwe qedexeyê bikin. Tiştên din î balkêş ji ev e, sazî û kesên ku alikariya dargî ji bo şerê qirêjî dikin wisa ji bacê muaf dibin. Her wiha fona ku ava bibe dê ji hemû çavdêriya dîr be, kes dê nikaribe kontrol bike. Xalên ku ev pêşniyar di-hundirîn evin:

1-Kesên ku rêxistinekê ji qanûnên der ava bike, heta 10 salan cezayê hepsê û 500 milyon ji cezayê diravî distîne. Ew kes heke li ser navê wê rêxistinê sîc bike 300 milyon din pere û cezayekî hîn giran ji yê hepsê distîne.

2-Kesên ku, ji rêxistinekê bi vî rengî re alikariya diravî bike an ji aliyê dargî ve wê xurt bike û piştgirî û propan-gandaya wê bike, wek endamê wê tê nirxandin. Cezayê wan kesên ji 3 salan ta 5 salan heps, 300 milyon ji pere ne.

3-Heke alikariya diravî bi awayê sazkirina rêxistinekê din (Komele, sendîka, partî û hwd.) çê bibe, divê ev rêxistin

Serê li Kurdistanê hemû riyên li ber dewletê digire. Ji ber ku hêzên dewletê li hemberî şerê gelê Kurd di tengasiyê mezin de ne, dev ji hemû formalîteyên demokrasiyê berdidin. Êdî qanûnê terorê ya kevin bi kêrî wan nayê, ji lew re pêşniyara qanûneke nû bi destê Wezareta Hundirîn hate amadekirin û dixwazin bi lez û bez têxin rojevê.

bên girtin û dewlet dest deyne hemû heyînen wan saziyan yên dargî. Her wiha kesên ku bi biryara rêxistinekê ji derî qanûnên dikanên xwe dadin, divê heta şeş mehan ji ticaretê men bin û li gorî sîcê wan ji salekê ta 3 salan ceza bistînin.

4-Xwediyên rojname û kovarên ku piştgiriya organizasyonê qedexekirî bikin û ditînen vê biweşînin, divê ji 200 milyon heta 500 milyon LT (Lîrayên Tirk)î ceza bidin. Nivîskarên wan rojname/kovaran ji divê nivê vî cezayî pere bide û ser de ji, ji 6 mehan ta 2 salan cezayê hepsê bistînin. Rojname/kovarên ku ev tişt tê de hatibin weşandin ji sê rojan heta mehekê girtî dimînin. Heke sîc dubare bû ceza ji du qat dibe.

5-Kesên ku bi nivîskî an ji bi propagandaya aktîf, wek tevlibûna xwepêşandan, propagandaya devkî, saziyên dewletê yên laîk bike nîşangeh an ji êrîş bibe ser yekparetiya welêt, divê heta 5 salan cezayê hepsê û sed milyon ji cezayê pereyî bigire.

6-Hejmara parêzgerên ku dikevin mehkemeyan, kesên ku ji bo sîcê terorê tewanbar dibin, divê bi biryara dadgehê karibe bê sînkirin. Heta roja ku mehkemê dest pê bike, dadger dikare nehêle der barê kesê ku tê sîcdarkirin de agahî bê dayîn. Divê dadger, li cihê ku sîcdar û parêzger hevdu dibînin amade bin.

7-Yek ji hêzên fermî, heke ji ber sîcê ku tê tewanbarkirin pêwîst be bê mehkemê, divê bi biryara dadger, bi danîşînen weşarî bê darizandin.

8-Kesên ku sîcên terorê kirine, divê di girtîgehên herî bi ewle de û di qawîşên ku ji bo kesekî an ji sê kesên hatine amadekirin de cezayê xwe bikişînin. Têkiliya wan a bi girtiyên din re, an ji bi hev û din re divê qedexeyê be. Divê ziyareta lîzîmên wan di bin çavdêriya rayedarên girtîgehê de pêk werin. Kesên ku rewşê baş nîşan dan, piştî ku nivê cezayê xwe kişandin, dikarin cezayê mayî li girtîgehê din tewaw bikin.

9-Divê fonek ji bo şerê li dijî terorê bê afirandin. Kana vê fonê ji divê ji hinek fon û saziyên din bînin guhezînin. Ev

sazî û fon ev in: Ji fona ji bo lîsansa ticarî %5, banka û şirketên ku hevparekî wan jê dewlet be divê ji kara xwe yê salekê %5, %10 dahata trafikê, %10 dahata ruhsata çekan, %10 dahata ehliyeta trafikê, %10 dahata belgeyên niştecihbûnê û %10 ji dahata şeşarên hawirdekirî. Herwiha %5 dahata pêşbaziyên sporê û hespan û %5 ji dahata piyangoyê. Hemû kanên ku ji bo vê fonê ten bikaranîn şexsî an ji şirket ji dayîna bacê muaf in. Hemû xerckirinên vê fonê dê ji çavdêri û kontrolê dîrin

10-Dema girtina kar, divê



pêş kesên ku di şerê li dijî terorê zirar dîtine û lîzîmên wan bînin girtin.

11-Divê cezayê heps ji salekê heta sê salan ji bo kesên ku alikariya rêxistinekê ji qanûnê der kiribe û beşdarî meş û protestoyên din bûbe bînin dayîn. Dikandarên ku ji bo protestoyê dikana xwe rade, divê ji bo 6 mehan vekirina dikanê jê re qedexeyê be, sofirê ku ji bo vî armancê di protestoyê de cih bigire, dîsa ji bo 6 mehan karkirin jê re qedexeyê be.

12-Divê cezayê kesên ku li dijî berjewendîya dewletê daxuyaniyekê bike zêdetir bibe.

13-Dema di binçavde ma-

yîna kesên ji sîcê terorê hatine girtin, zêdetir bibe. Hemû heyînen dargî yên rêxistinên ji qanûnê der divê dest li ser bê danîn.

14-Ji hêzên ewlekariyê ku di pozberiyên de birîndar bûn û lîzîmên kesên ku di şerê li dijî terorê de mirî re mehmiz (meaş) bê dayîn.

15-Endamê rêxistinekê bi vî rengî ku xwe bispere hêzên ewlekariyê, ger tevli tu livbaziyan nebûbe û der heqê rêxistina xwe de hêzên fermî agahdar bike, divê neyê darizandin. Qanûnê Poşmaniye ku ji du salan carekê tê dirêjkirin, divê bikeve statûya timî.

Mebûsan çare li parlamentoyê dîtin


Navenda Nuçeyan- Parle-menterê ku bi koka xwe Kurd in, di roja 2'yê mehê de li ser pirsgerêka Kurd li hev civiyên û cihê çareser-kirina pirsgerêka meclîs dîtin. Ji 74 kesên vexwendî 23 kes beşdarî civînê bûn. Mebûsên DEP'ê ji ber ku nehatibûnê vexwendin beşdarî civîna ku li parlamentoyê pêk hat nebûn.

Civîna ku bi pêşengiya mebûsê DYP'ê yê Erzeromê Abdulmelîk Firat, mebûsê Sêwazê yê SHP'ê Ziya Halîs, Mebûsê Qersê yê CHP'ê Atilla Hûn, Mebûsê RP'ê yê Ruhayê İbrahîm Halîl Çelik û mebûsê ANAP'ê yê Wanê Şerîf Bedirhanoglu li dar ketibû, bi beşdariyê ku nedihate hêvîkirin pêk hat. Ji 74 mebûsên vexwendî bes 23 parlamenter ketin civînê û bang li mebûsên DEP'ê ne-hate kirin.

Piştî qedîna civînê li ser navê pênc mebûsên ku civîn saz kiribûn mebûsê Sêwazê yê ji SHP'ê Ziya Halîs daxuyand ku, li ser cihê çareserkirina pirsgerêka li herêmê heye li hev kirine û ew der parlamentoyê" û dê bi beşdariyê fi-rehtir di 5'ê Mijdarê de civînekke din li dar bixin.

Ziya Halîs diyarkir ku, armanca wan bi parlemen-terên herêmê ku wê derê baş û ji nêzik ve nas dikin re, çareyekê ji meseleyê re dîtin e.

Di civîna 2'yê Mijdarê de, ji SHP'ê 12, RP'ê 7 û ji ANAP DYP û CHP'ê ji 1 palementerî cih standibûn.



Êrîşên dewletê zêde dibin

Dadgeha Ewlekariya Dewletê (DED-DGM) biryara î-dama şeş (6) endamên Devrîmcî Sol (Şoreşa Çep) stand, ji bo deh (10) endamên vî rêxistinê ji cezayên hepsê hatin birîn.

Li Stenbolê di meha Adara 1993'yan de hêzên dewletê li hember Devrîmcî Sol ê Operasyonê dor-fireh pêk anîbûn. Di vî operasyonê de 16 endamên rêxistinê hatibûn girtin û ta niha ji darizdina wan di DED'ê de didomiya. Di dadgeha dawî ya di 2'yê Mijdarê de, der barê 6 endamên Devrîmcî Solê de cezayê îdamkirinê hate xwestin û ev ceza hate birîn. Ev biryar li gorî qanûna 146-1 hate standin. 10 endamên rêxistinê ji li gorî qanûna 162-2 bi cezayên hepiskirinê hatin cezakirin.

Girtiyên ji vî dozê, piştî îlankirina cezayên wan ji aliyê dadgehê ve, bi van gotinan biryara dadgehê protesto kirin: "Tirkiye îro cihê înfazê bîdarizandin e. Ev 8 meh in ku em bê sebeb hatine girtin, niha ji dadgeh me li gorî îfadeyên me yên ku di bin îşkenceyê de hatibûne girtin, me ceza dike. Em sîcdar nîn in." Li aliyê din li Stenbolê 7 endamê TİKB (Yekîtiya Komünîstên Şoreşgerên Tirkiyeyê) ji aliyê polîsan ve hatin girtin. Li gorî beyanatên polîsan ev 7 kes, ji ber gelek livbaziyên xwe yên li hember dewletê sîcdar in û polîs ji zû ve yê ku li dû wan e.

Midyefiroşên Kurd ên Stenbolê

Polîs nahêlin em vî karî bikin

Li Stenbolê li taxa Asaray ku mirov di kîjan kuçe û kolan re derbas dibe, bi sedan kes yan li ser erebokan yan jî li ser tableyan tiştina difiroşin. Ê ku bi vî awayî dixebitin xort, jin, zarok û kal in. Tiştên ku difiroşin jî simit, ava cemidî, midye, girara birinc, saetên destan û hwd. in. Tiştê bala mirov dikşîne ev e ku, ew seyarfiroş giş Kurd in. Hevalê me çû cem Midyefiroşan û li ser rewşa wan bi wan re sohbetekê kir û der heqê jiyana van de, xire cira wan û zabitayên Belediyeyê, tiştê ecêb jî zordariya ku Polîsên Tirk li wan dikin pêşkeşî me dike.

Pêşî em dixwazin we nas bikin.

-Navê min Baqî ye. Lê ji min re dibêjin Evdilbaqî. Di sala 1958'an de li gundekî bajarê Merdîne hatime dinê.

Hûn jî kengê ve vî karî dikin?

-Ev 10 sal in ku ji midyefiroşî pê ve min tu tişt nekiriye.

Nexwe karê we baş e?


-Wele heta beriya bi salekê baş bû, lê niha qet ne baş e.

Çima?

Wele ez jî nizanim. Berê ez bi serê xwe derdiketim bazarê, bi hindikayî roja min 500 hezar dihat lê niha 3 hevalê min jî ji min re dixebitin dîsa jî hew çend ji min re namîne.

Sedemê wê çi ye?

-Beriya salekê me kîloya birincê bi 5 hezarî distand lê îro bi 1415 hezarî ye. Ê ye me, berî bi salekê jî, me mid-



Li bajarên mezin karê serdest û piyan her para Kurdan e, lê ger uk polîs û zabita bihêlin.

ye bi hezarî difrot, îro dîsa bi hewçendî ye. Wekî din jî, polîs nahêlin ku em karê xwe bikin. Weke ku di şûna PKK'ê de me leşkerên wan kuştibe û wan jî em bi dilî girtibin ku ew jî heyfa xwe ji me hilbidin.

Bi wî awayî li we dinhêrin?

-Erê wele wiha dinihêrin.

Ji ber ku min carekê nasnameya xwe wînda kiribû, ji bo ku ez cardin bistînim diviyabû

ku ez jî qereqola vê taxê kaxezekê bistînim. Bi dilekî xweş ez jî çûme qereqolê min derdê xwe ji wan re got, wan ez şandim ba qomserekî. Qomsêr li min nêrî û got: "Tu ji ku yî" Min jî got: "Ez ji Mêrdîne me." Got: "Perê te hene?" Min got: "Na. Ez mirovekî feqîr im, desteng im, wê pereyên min ji ku hebin." Qomsêr hêrs bû û wiha got: "Ma-

dem pereyên te tune ye here Kurdistana xwe bila Apo (Abdullah Öcalan) nasnameyê te bide te." Ez jî xwe re heyîrî mam. Paşê jî got: "Siktir bel Cardin ez te nebînim li van deran."

Te çi kir?

-Min nêrî ku wê li min bixwe, min xwe li dîntî danî û qîr da devê min vebû, hey got: "Sus" jî, min guhê xwe qet

nedayê.

Te çi jê re digot?

Min got: "Yan tê a niha min bişinî dewleteke biyanî yan jî tê niha kaxezê ku ji min tê xwestin bidî."

Te sitand?

-Sond xwar got: "Heta ku tu çixareyêke Marlboro ji min re nekirî ez nadim."

Te çixare jê re stand?

-Lo min got qeda lê keve. Erê wele min stand.

Em veşerî ser meseleya xwe, hûn midyeya ji kur tinin, çawa çêdikin, difiroşin?

-Keko, midye ji me re bi çîwalan tinin, heta devê derî, em jî wan paqij dikin. Malzemê xwe dixin navê û dertînin bazarê. Em û nesibê xwe.

Malzemeyê we çi ne, hûn çi dixin navê?

-Birinc e, jixwe di nava midyeyan de goştê wan heye, pîvaz, biharat û hwd.

We got em bi çewalan midyeyan distînin. Buhayê wan çawa ye, gere erzan be?

-Midye ku paqij ji me re bî erzan in, lê di nava çewalê 20 kilo de incex 100 lib dertên, bi vî awayî jî giran tê, çewalê midyeya niha bi 45 hezarî ye.

Yên ku li ba te dixebitin çawa idareya wan dibe?

-Kesekî xerîb li ba min tune ye. Roja ku bixebitin yewmiyeya wan 50 hezar e, nan, xwarin, wexwarin û razana wan ez temîn dikim. Wele ez tim dibêjim werin em bi nivî bixebitin jî, qebûl nakin.

Ez dixwazim tiştêkî dinê bibêjim, Kê ewil midye keşkiyê, ditiyê?

-Bira.. Wexta em zarok bûn ku yekî gundiye me ji Anadolê dihat berika wî tije pere bûn. Me jî meraq dikir û me jî bavê xwe dipirsî. Ka wî hewçend pere ji kur anîne. Hengê bavê min wiha digot: "Lawo ew çûye İzmirê, Stenbolê ji xwe re tiştêkî ditiyê û difiroşe navê wî tiştî jî midye ye, wan difroşe û pereyan kar dike".

Em dikarin bêjin ku Mêrdîniyan ev kar keşî kirine?

-Ev gotin a bavê min e. Niha hinek tî jî me dipirsî dibêjin ku hûn çawa vî karî dikin. Li gor xwe em jî pîrsa wan dibersivînin, lê dibe hire hira wan û dikenin, dibêjin: "Em fileh in, ev kar me keşkiyê û niha jî hûn dikin". Tiştê ez dizanim ev e.

Hûn doza Kurdistana çawa dibînin?

-Bi serkeftin wê biqede. Ji ber ku bedelê welat bi xwîna şoreşgeran hatiye dayîn. Ez bi Xwedê sond dixwim ku, êdî ji şoreşê pê ve tiştêkî nemaye. Ha îro ha sibê ye.

Tiştêkî me ne pîrsî û hûn bixwazin bêjin heye?

-Ji bo rojnameya Welat serkeftin dixwazim û pîr spas dikim.

Hevpeyvîn: Salih Günbat

Mihrîcana Hunerkomê

Welat-Braunsweige- Yekîtiya Hunermendên Welatparêzên Kurdistanê (Hunerkom) her sal hawîrkana muzîk û govenda Kurdî li dar dixîne. Ev hawîrkan di navbera hemû komên hunerî yê girêdayî Hunerkomê de, ku li gelek welatên Ewropî û yê din cih digirin, çêdibe.

Îsal Hunerkomê roja 30-31'ê Cotmehê li bajarê Braunsweige ku girêdayî herêma Hannoverê ye -li gorî ERNK'-ê- mihrîcana xwe pêk anî.

Di eynî roja 30'yê Cotmehê de (şemî) li Kolnê bi beşdariya 40 hezar Kurd û dostên Kurdan qirkirina Liceyê dihate protestokirin. Qêrîna 40 hezar kes ku bi yek dengî û bi yek heycanî bang dikirin: "Întîqam", canê mirov dilerizand.

Ji heftan heya heftê salî, hemû diqêriyan: "Emê hesabê Liceyê ji dijmin bipirsîn", "PKK gel e, em PKK ne".

Li mihrîcana Hunerkomê gelek hozanan berhemên xwe pêşkêş kirin. Koma Azad jî, ji Amedê hatibû, wê jî sê (3) stran gotin, bi hatina wê beşdar gelek şa bûn.

Hevala Besê jî rabû ser sehneyê. Ezê ji we re çi bibêjim, tu nemabû ku gel were wê ji ser sehneyê birevîne. Strana "Kurdistanê Kurdistan" Kilîseyê Dom'ê hejand. Min bi xwe jî spikerî dikir, herkes ji min ve baş dixuya, hevala Besê jî ji şabûnê re tu

nemabû çav tijî hêstir bibin.

Ew meş bi wan marş û axaftinan derbasî serhildaneke neteweyî bû. Alên ERNK'ê li jorê hev dixwarin. Gel bi wê heyecanê êrîş dihanî ser sehneyê.

Belê Beser Şahîn di komîteya jûriya mihrîcanê de jî cih digirt. Hawîrkana muzîkê di roja duyemîn de bû. Me piştî meşê li jêr hev dît. Jixwe di rojên wisa de her kes hev dibîne, dibin rojên cejn û hevdiînan. Ezê ji wir (Koln) veşeriyama cihê mihrîcanê.

Hozan Beser û Koma Azad dixwestin zûtîrîn xwe bigihînin mihrîcanê. Ji min alîkarî xwestin, lê hema ez bi xwe rêwî bûm, min jî dixwest ez xwe bigihînim mihrîcanê. Hema li bayê bezê otomobîlek peyda bû û hevalan xatirê xwe ji me nexwestin û berê xwe dane mihrîcanê.

Xem nake emê careke din hev bibînin. Tiştêkî di ser re derbas nebû, me hev li mihrîcanê dît.

Ev cara yekemîn e ez beşdarî mihrîcana Hunerkomê dibim. Lewma jî gelek tişt bi min nû hatin. Min weke rojnamevanekî ji xwe re lê temaşe kir, ez dixwazim nêrîna rojnamevanekî ji we re bînim ziman.

1-Ji bo pêşvebirin û parastina çanda me ji asimilasyona hezaran salan, ev hawîrkan gaveke gelek pîroz û nirxdar e.

Hem ji hêla moralê ve, hem jî, ji hêla nirxandina hunerê ve gaveke ber bi sazûmankirina huner û pişeyêke zanistî ye.

2-Amadekariyên komên folklor û muzîkê xurt bûn. Hatîna û tevlibûna hawîrkanê cidî dîtibûn. Ji nêzîkbûna wan ve diyar dibû ku, dilxwazên vê xebatê ne. Huner berî her tiştî moralê dixwaze, ew moral dihate dîtin.

3-Rojnamevan, nivîskar û mêvanên cur be cur kêmbûn. Elbet ev jî kêmasiyek e, vê yekê diyar dikir ku amadekarî qels bûye. Ji bo mihrîcaneke wisa mezin ku li seranserê Ewropayê tenê, ji hêla Hunerkomê ve her sal tê amadekirin, diviyabû bi dehan rojnamevan û nivîskar beşdar bibûna. Ji hêla din ve rojname gelekî li ser nesekinîn, bi vî awayî mihrîcan ji bo awira giştî girtî dimîne.

4-Organîzekirin û amadekirina mihrîcanê ya du rojan qels bû, ji bilî muzîk û leystikan diviyabû programên taybetî ji hêla hinek dengbêj û hozanan ve, mihrîcan bi şahiyêke mezin kuta bû. Dîsa Besê derket, dîsa temaşevan rabûn ser piyan, vê carê li dawîya şevê me xatir ji hev xwest. Bi hêviya mihrîcaneke hîn serkeftî em belav bûn.



Min nedaye dû malê dinê, ji nivîsandi-
na şîrê pê ve.

Seydayê Tirêj
Şairê Kurd

KÊ ÇI PEKAND?

Cihêkî weke qula derziyê jî tune ku dewlet
nikaribe bikevê

Süleyman Demîrel
Serokkomarê Tirkiyeyê

Xoce çav berda artêşê jî

Xoceyê min î bejinstûr, estîgir û kin î kurt î kutilk, wek Xoceyê Xizir tê li hawara dewleta Kemo. Xewn û xew-nerokên wî bi carek, yeko yeko rast dibin û tene cih. Artêşa kemalîst û notirvanê "şoresên" wî ku, ji dîndarên misilman re deriyên wê radayîbûn, niha xwe dispêre Xoceyê me. Ji bo ku bê tîmarkirin û ji nû ve bê saz-
kirin.

Di kongreya xwe de Michahîd Erbakan jixwe diyar kir ku nêzîkî 40 general beşdarî partiya wî bûne. Gelek kes berbayî gotinên wî neketin. Xoce jî pê de diçû û digot: "Atatürk ku niha sax bûya dê bibûya endamê partiya me." Dîsa gel ji xwe re got: "Xoce ye, çî tê ber devê wî dibêje." Li wî û daxuyaniyên wî bi awayekî cidî nedihat nihêrtin. Wek ku yekî xurifî û bi xwe nikaribe ev gotin gotibin. Hêviya îslam û Tirkiyeya xort, dîsa hin kes bi gotinên xwe mat dikirin. Bi vî devê xwe yî pîroz û bi zarê xwe yî şîrîn "Ez û generalên xwe em dê artêş jî nû ve saz bikin", digote me.

Ma rizgarkerê ola îslamê bi tenê çavê xwe berdaye nûkirin û tîmarkirina artêşê? Na bi Xwedê, deshilat (îqtidar) jî li bend û hêviya Necmettîn Erbakan e. Bi îzna Xwedê her serkeftin a wî ye û jixwe para wî ye jî. We got qey bi tenê kesên "bawermend" ên Tirk-Misilman riya Xoceyê me yî dilovan dipên? Na, na. Gelê Tirkiyeyê tev bi hevve çavên wan li riya wî qerimîne, tevî hemwelatîyên me yê bi koka xwe Kurd jî.

Ê piştî qedexeya PKK'ê niha li bajarê Diyarbekirê ku hin kes jê re dibêjin Amed û wê wek paytexta Kurdistanê ji xwe re dihesibînin, ji bilî DEP'ê Refah (Partiya Refahê) ne bi tenê vekiriyê? Ev rewş tê çî wateyê?

Ji ber ku Refah partiyek îslamî ye û tu meyl û hemlê nake navbera hemwelatîyên me yên ku nîjada wan, ola wan, zimanê wan ji hev cihê ne. Lewma dikare xwe li her derê Tirkiyeyê jî bigire û xwe birêxistin bike, alîgirana çêbike. De em nizanin hin çavnebar dibêjin ku, hêzên serdest tevî Amerîkayê dixwazin bi partiya Xoce rê li ber parçebûna Tirkiyeyê û bizava veqetînxwaz a Kurdî bigirin. Ê bi Xwedê binê vî tiştî tune. Hişk î virr e. Xoce tevî partiya xwe ji berê ve amade ye ku birînen Tirkiyeyê bikewîne, baş bike û Tirkiyeyê ji nav lepên împeryalistên fileh bifelîfîne û her wiha welat jî tengasî û xetereyan derxe.

Ca werin em tev bi hev re, li dek, ewan, fên û li teşqelxwazan binihêrin. Xwedêgiravî hêzên serdest tevî Amerîkayê li dû çareyan ketine ku Tirkiye ji tarî û talûkeyan rizgar bikin. Di dawiyê de dîtine ku ji nav pêşengan Necmettîn Erbakan bi tenê serokwezîrtî nekiriye û partiyeke îslamî nehatiye, deshilatî nekiriye destê xwe. Di vî rewşê de Xoce û partiya wî yek bi yek dîtine ji bo çareyê. Bi şertê ku dê yekîtiya welat û millet biparêze. Tenê Refah dikare bi PKK'ê re serî derxe û belayê jî Tirkiyeyê dîr bike. Ji ber ku gelê Kurd jî misilman e, bi piranî. Her wiha Xoce dikare terka ku di navbera Kurd û Tirkan de çêbûye, bi zemqâ olî ya îslamî bîne ba hev û bi hev ve bizeliqîne.

Sanaryo hîn jî didome, hûn lê bimêzin. Qaşo Amerîkayê jî Xoce re çav kiriye û jê îslamiyeteke nerm û bêdeng dixwaze. Erbakan jî pêşniyar û daxwazên serekê împeryalîstan pejirandiye. Lijneya Ewlekariya Neteweyî (MGK) jî pê re têkilî daniye û dest bi xebatan jî kirine. Yek ji van xeba-



tan, beşdarbûna generalan a Refahê bûye. Alîkarî naqedin, xwedêgiravî li Başûrê Rojavayê Anadolê 132 kes ji partiya Xoceyê me re dîtine ku, di hîlbijartina herêmî de ji bo belediyên û lijneya wê berendamîya xwe deynin. Vê navberiyê jî qaşo General Erşan Nurî Kayra kiriye ku niha ji artêşê teqawid bûye û di MÎT'ê (Rêxistina Îstixbarata Neteweyî) û Özel Harb Daîresî (Dezgeha Şerê Taybetî) de xebitiye. Her wiha general jî, ji Sêrtê ye û hwd.


Em kin û kurt bibirin. Her dilnexwaz bi virr û niçeyan bi dû mirov dikevin. Lê bila bizanibin ku derew li miriyan dibin, ne li zindiyên. Ev welat bi tenê bi têkilîbûna Xoce û partiya wî dikare ji hev neqete, parçe wesle

nebe. De hûn bi xêza Xwedê bikin li vî welatî çî saz maye? Tiştêkî ku neteribî be heye gelo? Bi destûra Yezdanê dilovan û bi saya serê Xoceyê Xizirdê Tirkiyeya me karibe ji vî tengasiyê derkeve û ta dawî bijî. Lê em ber wan derewan dikevin ku, leke li pêşveçûn û xebatên Xoce dixin. Em pê diêşin, ji ber ku dibêjin: "Sîtil ket çingiya, çî şkest çî kopîya." Tiştêk heye, em jî xwe pê diewiqînin. Ew jî ev e: "Virr sêwî ye, berê wê bi ku ve kirine çûye lê dawîya wê bihost û çar tilî ye." Xwedê jî pêşiyên me xweş be, çî delal gotine. Di dawîya dawî de her rizgarkerê Tirkiyeyê û îslamê Xoceyê Xizir ê dewra me Necmettîn Erbakan e.

Zana Farqînî

Jûjî...

Doğan Güzel



* ILERZİROMÊ ÇI BÛR
EW "GEL"Ê KU
LI DÛJÎ KURDAN
RABÛ, KÎ BÛ?...
GELD BI RASTI
GEL BÛ P...

Pêkeniyên dora Midyadê

ÇI EYAR BE

Pift kete rezê yekî gundi. Xwediyê rez bi zirt ban kir: Mêze bike heke ez werim, ezê te ji wê eyar bêxim eyarekî din...

Pift kemyera xwe xera nekir û wiha bersiv da: Tu min têxî çî eyarî, ji yê min çetir e. Hema tu serbest î...

DU KEŞE

Pift li kerê xwe siwar e û di nava Basibrînê re dibore. (Basibrîn gîş fileh in) Gund li ber siya xaniyek rûniştî ne û li sê seyan difericin. Du seyên reş li yekî spî dixin.

Gund hemû bi ken dibêjin: Wa ye Pift! Melayê we şepirze kirin! Pift li wan vedigere û dibêje: -Ma hûn nizanin? Ku du keşe herin meleyekî, jixwe ewê wî şepirze bikin.

HEÇÎ WERE NAV VÎ REZÎ!

Dîsa Pift kete nava rezê yekî Zaxuran. Xwediyê rez bi xerbaran û bi berz hate wî:

Sebav... Tu fedî nakî, bêdestûr dikevî rezê min?... Pift goşiyê tirî li erdê dixê û dibêje: "Va ezê ji nav rez derkevim. Lê heçî ji min û te kî were nav vî rezî bênamûs be..."

Berhevkar: Jîr Dilovan

Gelê Kurd aştîyê dixwaze, dewlet jî şer pêşkêş dike

Pêşbaziya şer û aştîyê

Navenda Nûçeyan- Li Tirkîyeyê her ku şer ji aliyê dewletê ve tê diwartîrkirin, hêviyên aştîyê jî zêde dibin û kesên ku di pirsgerêka Kurdî de çareserîya demokratîk diparêzin, her diçe dengê xwe bilindtir dikin. Dewlet li aliyê gelê Kurd bi tevahî ji xwe re dike hedef, gund û navçeyan hildiweşîne û qetliaman pêk tîne, li aliyê din jî, bingeha van qetliaman di qanûnên xwe de ava dike û qanûnên ku hene li gorî rewşa nû û politîkayên xwe yên faşîstî, ji nû ve sererast dike. Bi

vê jî namîne di nav gelê Tirk de, li hember Kurdan tovê neyartiyê diçîne û gel ber bi şerê Kurdîyê ve bi rê dixê. Li metropolên Tirk tevgerên nîjadperest ji aliyê dewletê ve bi destekeke berbiçav tînin birêxistin û li hember Kurden koçber tînin tûjîrkirin. Li gelek bajarên Tirkîyeyê û li hin bajarên Kurdistanê bûyerên ku ji aliyê hêzên nîjadperest ve tînin pê, her diçe zêdetir dibin. Dewlet soz dide van tevgerên nîjadperest ku, dê li hemûyan çek belav bike. Ger bi vî awayî biçê dê di rojên

pêş de bûyerên girîng biqewimîn û gelê Tirk û Kurd li hember hev bikevin şerêkî dijwar

Dewlet malîyeta şer jî, ji piştê gelê Tirk ê ku li hember Kurdan hatîne tûjîrkirin, derdixê. Serokwezîra Hikûmeta koalîsyonê Tansu Çiller bi awayekî vekirî dadixuyîne ku, şer xesareke mezin digihîne ekonomîya Tirkîyeyê û divê hemû kes bibin şîrikê ve malîyetê. Hikûmet jî bo ku malîyeta şer ji piştê gel derxe her roj buhayê hemû tiştan zêde dike û bac (vergî)ên nû peyde dike. Sermayedarên Tirk jî, her diçe bêhtir dibin şîrikê malîyeta şer û bacên wan jî tînin zêdekirin.


Gelê Tirk, ji ber ku mejîyê wan bi îdeolojiya nîjadperestî hatîye şûştin, hîn nabin ku ev şer li ser piştê wan dimeşe û ji ber vî şerî her roj hinekî din xizan dibin. Lê sermayedar hay ji xwe hene ku, dewlet barê şer li piştê wan siwar dike û ji ber vê yekê jî dixwazin xwe ji vî barî rizgar bikin. Bi vê armanca jî beyanatên çareserîya demokratîk didin û dewletê vexwendîyê aştîyê dikin.

Jİ SERMAYEDARAN BANGA ÇARESERİYA DEMOKRATİK

Li Tirkîyeyê tewra ku ji partî û rêxistinên siyasî dihat hêvîkirin, ji sermayedarên derket û serokê TUSIAD (Komeleya Bazîrgan û Senayevanên Tirkîyeyê)ê Halîs Komîlî li ser navê komeleyê, hikûmet vexwendîyê aştîyê kir. Serokê TUSIADê di civîna xwe ya çapemeniyê de daxuyand ku, divê ji pirsgerêka Kurdî re çareserîyeke demokratîk bê dîtin û ev pirsgerêk bi riyên leşkerî nayê çareserîkirin. Halîs Komîlî, dayîna mafên Kurdan parast û diyar kir ku, divê ev maf bi qanûnan bêne garantîkirin. Piştî vê beyana TUSIADê, gelek alîgirên ve ramanê jî bi beyanan piştgirî dan Halîs Komîlî. Hema hema hemû rêxistinên sermayedarên Tirkîyeyê piştgirîya xwe ya bi çareserîya demokratîk îlan kirin. Dû re jî şîrikê hikûmetê, Serokê SHPê Murat Karayalçîn piştgirî da TUSIADê.

LIVBAZIYÊN NİJADPEREST Û TEORİYÊN ŞERÊ HUNDIRÎN

Dewlet, ji bo şerê xwe yê qirêjî yê ku li Kurdistanê dimeşîne, gelê Tirk bi îdeolojiyê nîjadperest dadigire û li hember Kurdan bi rê dixê. Bes dewlet bi du armancan nîjadperestiyê belav dike. Li aliyêkî di şerê xwe yê qirêjî de alîgirên xwe zêde dike, li aliyê din, ekonomîya xwe li gorî rewşa şer bi ser û ber dike û malîyeta şer bi zêdekirina buhayê esyayan û bi ba-



can li piştê gel siwar dike. Gelê Tirk ê ku serê wî bi ve ramanê hatîye dagirtin, tevî ku her roj hinekî din xizan dibe û barê wî giran dibe bi kirînen dewletê nahese û dewlet jî bi vî awayî dikare karê xwe bimeşîne.

Li gelek bajarên Tirkîyeyê û li hin bajarên Kurdistanê, nîjadperestên ku ji aliyê dewletê ve tînin birêxistin, êrişên xwe yên li hember Kurdan her diçe zêdetir dikin. Li Erziromê piştî çend êrişên PKKê yên li dorhêla Erzeromê, dewlet bi komployekê mezin faşîstên girêdayîyê MHPê bi meşekê bi ser Kurdan ve bi rê xist û ev bûyer wek livbaziyeke mafdar ji aliyê hemû partiyên Tirk ve hate parastin û pejirandin. Serê ve komploya li Erziromê waliyê dewletê bi xwe dikişand û li beşdarên meşê sozê belavkirina çekan dida. Li metropolên Tirkîyeyê jî mal û kargehên Kurdan, ji aliyê hin kesên girêdayîyê dewletê ve tînin tesbîtîkirin û ev wek tehdîda êrişêke bi giştî her roj hinekî din belav dibe. Li navçe û gundên Tirkîyeyê jî li hember Kurden koçber, êrişên bi giştî tînin organîzekirin û di van bûyeran de birîndarî jî pêk tînin.

Êrişên nîjadperest ên li hember Kurdan li Tirkîyeyê wisa belav bûne ku, di pêşbaziyan futbolê de jî, sloganên xwînmêjiya Kurdan tînin avêtin û wateya sporê jî bi vî awayî li Tirkîyeyê diguhere û ev yek jî ji bo domandina rejîmê ji aliyê dewletê ve wek navgîneke girîng tê bikaranîn. Iro bi tenê navê Liceyê he-

ye, wekî din ev navçeyên Kurd bi temamî vala bûye û gelê wê koçberî bajar û navçeyên der û dor bûne. Dewletê bi hilweşandina Liceyê re, di nav gelên Kurd û Tirk de birînen xedar veda. Lê nikaribû jî binê ve provakasyonê derkeve. Di destpêkê de bûyera Liceyê wek êrişêke PKKê hate îlankirin, lê dû re rastî bi hemû hêza xwe ve xwe da der û niha herkes dizane ku Lice bi destê dewletê hatîye hilweşandin.

LICÊ NAYÊ JIBÎRKIRIN!

Kurden li hemû dewletên dinyayê belavbûyî, ji bo protestokirina qetliama Liceyê, livbaziyan girseyî pêk anîn. Welatên Ewropayê bi protestoyên Kurdan hejiyan û mecbûr man ku li rastiyê bigerin. Meşa li Almaniyayê bi besdariya 40 hezar Kurdî bi serfirazî xelas bû. Dû re jî li hember sazî û konsolosiyên Tirk livbaziyan Kurdan pêk hatin û Liceyê rojê Ewropayê jî dagirt. Hemû weşanên Ewropî jî qetliama Liceyê dewleta Tirk berpirsiyar digirin û bi awayekî vekirî wê sûcdar dikin. Wisa dixuye ku, dê dewleta Tirk di bin barê berpirsiyariya Liceyê de bimîne û dê di rûpelên dîrokê de wek dewleteke qetliamker bê rûreşkirin.

Tevî hemû pêşveçûnên bi vî rengî, Tirkîyeyê di pêvajoyêke girîng de, li hêviya biryareke girîng a ku dê pêşeroja wê tesbît bike, rawestiyaye. Hêvî ew e ku di serê aştîxwaz û şerxwazan de, aştî bi ser bike û xwînrêjiya di nav herdu gelan de raweste.

ROJEVA WELÊT

“Aştî” ji bo herdu alîyan!

Peyva aştîyê iro her çiqas li gorî rewşê ji literatûra Tirkîyeyê û Kurdistanê derketibe jî, di rastiyê de, peyv xwe bi wateya xwe dixê rojevê û hêdî hêdî alîgirên xwe zêde dike. Dewlet jî bi vî “xwîne” tu peyveke din bi kar nayîne, an jî tenê ev peyv bi awayekî vekirî tê diwartîrkirin. Lê li gorî ku di van rojên dawî de eşkere bû, dewlet di nava xwe de dikelîje. Peyva “aştîyê” jî di civînen weşarî de tînin ziman. Şerêkî dijwar di nav hêzên ku dewletê ava dikin de didome. Iro xwediyên dewletê yên rasteqîn, yanî sermayedarên Tirk jî tevî ve guftûgoyê bûn. Diwartîrkirin ku, çareserîya leşkerî ne çare ye.

Sermayedar çi dixwazin? Serê ku li Kurdistanê ev zêdetirî 10 salan e didome, zerareke mezin gihandiye ekonomîya Tirkîyeyê. Li aliyêkî enflasyon, li aliyê din bacên (vergî) ku her roj tînin zêdekirin, hem li ser piştê gel û hem jî li ser piştê sermayedarên bûye barekî giran. Sistem xitimîye. Dewlet dixwaze malîyeta şer li piştê gel û sermayedarên siwar bike û dike jî. Dahatên dewletê tînin şer nakin, senayîya Tirkîyeyê di tengasiyêke mezin de ye û nikare xwe bi pêş bixe, sermayedar her diçe ji Kurdistanê vedikişin û bazara Kurdistanê winda dikin. Ev hemû dibin sedem ku, sermaye li dijî şer derkeve û çareserîya demokratîk biparêze.

Li aliyê din, sermayeya dinyayê jî nikare bikeve Kurdistanê, heta kargehên ku hene jî hêdî hêdî tînin girtin. Weke tînin zanîn şirketên welatên împeryalist, bi şîrikatiya sermayeya Tirk kargehan ava dikin û Kurdistan jî ji bo wan bazareke mezin e. Şer dike ku, tevgerên ekonomîk ji holê rabin û kara sermayedarên zirarê bibîne. Sermaye pêşerojê dibîne û dizane ku, ger şer geş bibe, dê bi rewşa iro jî nemîne û her biçê li ser axa Tirkîyeyê jî belav bibe û barê wan girantir bike.

Pêşniyara çareserîya demokratîk ya ku ji aliyê serokê TUSIADê Halîs Komîlî ve hate daxwazîkirin, di nav gelek sazîyên aborî, partiyên siyasî û rewşenbîran de jî deng veda û alîgirên ve daxwazê dengê xwe bilind kirin. Di nav wan de tewra girîng a Serokê SHPê Murat Karayalçîn bû. Karayalçîn tevî ku di hikûmetê de ye jî, tenê dikaribû piştgirî bide beyana Halîs Komîlî û ev jî rewşa wan a di nav hikûmetê de bi awayekî vekirî eşkere kir. Ev bi xwe nikarin çareseriyên bi vî rengî hilberînin, heta dîtinên xwe yên bi vî rengî pêşkêş bikin. Tewra wan a li hember “Qanûna Terorê” ya ku hikûmet dixwest ji nû ve bi ser û ber bike û madeyên wê diwartîr bike jî, nîşan dide ku, ev partî jî bo ku bikaribe di nav hikûmetê de bimîne, serî ji hemû daxwazên anti-demokratîk re pêl dike. Lewre DYP û SHP jî bi vî çend madeyên ve qanûnê, dîtinên xwe kirin yek û di nêzik de ev qanûna faşîzan derdikeve.

Wisa dixuye ku, dewlet heta hemû riyên leşkerî neceribîne, dê xwe ji peyva “aştîyê” dûr bigire. Lê rewşa Tirkîyeyê berevajiyê kirînen dewletê behtirîn nêzî aştîyê ye. Ji xwe jî bo wan jî çareyêke din nîn e. Lewre ger şer hinek din jî bidome, dê ekonomîya wan iflas bike û piştî ve radeyê, ne şer, ne jî aştî nikare wan xelas bike.

Li aliyê din, livbaziyan Kurdan ên li welatên Ewropa, bala raya giştî ya dinyayê bêhtir dikişîne ser ve pirsgerêkê û dewletên Ewropî her roj hinekî din xwe di nava vî şerî de dibînin û dibin aliyên şer. Ev jî dike ku, şerê li Kurdistanê xwe bigihîne ser axa Ewropa bi xwe û Ewropa jî ve yekê re ne amade ye. Ji ber vê yekê jî, her roj hinekî din zorê dide Tirkîyeyê, da ku çareyek ji ve pirsgerêka dijwar re bibîne.

Ev hemû yek, dema digihên hev û din, diyar dibe ku aştî ne dîr e û aştî ne ji bo Kurdan bi tenê, ji bo gelê Tirk jî pêdiviyêke mezin e, berjewendiyên herdu gelan jî di ve aştîyê de ye.

Sermaye zendan vedimilîne

Navenda Nûceyan- Di pey daxuyaniya Serokê "Tevgera Demokrasiyê ya Nû" Cem Boyner a der barê meseleya Kurdî de, der û dorên karsaz, kardêr û senayîvan (pîşesaz) yek bi yek li dû hev dest bi beyanatên li ser pîrsgirêka Kurdî kirin. Li Tirkîyeyê bi vî yekê re her diçe helwesta sermayedaran a der bara doza Kurdî de zelal dibe û daxwaziya çareya siyasî dikeve pêşiya ya leşkerî.

Piştî Cem Boyner, Serokê TÛSIAD'ê (Komeleya Karsaz û Senayîvanên Tirkîyeyê, KKST) Halîs Komîlî jî, daxuyaniyek li ser gelemşeya Kurdî kir û ji hikûmetê bi awayekî lezgînî dîtina çareyê siyasî û demokratîk xwest. Daxuyaniya Komîlî ya, "Meseleya Kurdî bi reformê tê çareser kirin" di nav rêxistinên karsaz, kardêr, bazirgan û karkeran de deng veda. Serokê TÛGIAD'ê (Komeleya Karsazên Ciwanên Tirkîyeyê, KKCT) Jehîfî Kamhî jî diyar kir ku, ew jî daxuyaniyên Komîlî diparêzin û piştgiriya daxwaziyên çareya siyasî dikin.

Li ser daxuyaniyên herdu rêxistinên ku yê senayîvan û karsazên Tirkîyeyê yê herî mezin in, saziyên din jî fikr û ramanên xwe daxuyandî û piştgiriya xwe diyar kirin. Cîgirê Serokê Yekîtiya Ode û Borsiyên Tirkîyeyê YOBT (TOBB) Hasan Denizkurdu, Serokê Odeya Bazirgan û Senayiyê ya Diyarbekirê Felat Cemîloğlu, Serokê DİSK'ê (Konfederasyona Sendikayên karkerên Şoresger) Kemal Nebioğlu, Serokê TÜRK-İŞ'ê Bayram Meral jî li ser van daxuyaniyan bîr û hizrên xwe dane der û dan nişan ku cihê çareser kirina gelsa Kurdî parlamentoya ye.

Li hember gavavêtin û daxuyaniyên saziyên sermayedaran, hawirdorên siyasî jî



Serokê TÛGIAD'ê û TÛSIAD'ê J. Kamhî û H. Komîlî

Serokên rêxistinên bazirgan û senayîvanên Tirk xwe didin nişan û êdî zendên xwe vedimilînin ji bo çareser kirina pîrsgirêka Kurdî. Sermayedar li hember tundîxwaz û alîgirên çareya leşkerî dertên û derdibirînin ku heq û mafên Kurdan divê bi qanûn û Qanûna Bingehîn bîn garantîkirin.

wêrekiyek hate û ev daxuyaniyên destek kirin, pişt dan wan. Serokê Giştî yê SHP'ê (Partiya Gel a Sosyal Demokrat) û Cîgirê Serokwezîra Tirk Tansû Çiller Murat Karayalçın, ev nîrxandin kir: "Divê ji hemû aliyan ve ev bûyerên ku diqewimin bîn zanîn û ji wan re çare bîne dîtin." Cîgirê Serokê Giştî yê DYP'ê (Partiya Riya Rast) Mehmet Dülger, "Çareya ku ne siyasî be ne çare ye" got û çav ji şerxwazan re şikand.

Hin nivîskarên qorziyan (quncîk) ên rojnameyên Tirk wek Mehmet Altan bi nivîsên xwe pişt dan daxuyaniyên serokên saziyên sermayedaran û rexne jî li kesên alîgirên çareyên leşkerî girtin. Her wiha bersiv dan siyasîvan û nivîskarên ku piştvanîya çareya leşkerî dikin, bi bîra siyasîvanan xistin ku dema berendamiya xwe datanîn, beriya her tiştî îcazetê ji sermayedaran

distantin û hê nû dadiketin qada politikayê, lewma divê guhê xwe bidine daxuyaniyan.

Ev gavavêtina serokên saziyên sermayedar û dewlemendan û tevî hin kesên siyasî kir ku, êdî gengeşiyên li ser çareya siyasî ji bo helkirina gelemşeya Kurdî di rojevê de cihê xwe bistîne û herdu berên alîgirên çareya leşkerî û siyasî bi hev re tîbikoşin. Her wiha êdî şîrketên ku karê wan ew e ji partiyên siyasî û saziyên sermayedaran re anket çêdikin, dest bi xebatên xwe kirin ka raya giştî a Kurd û Tirk kîjan çareyê dixwaze.

Kovara Tempo'yê xebatek bi vî rengî weşand, tê de dixuye ku gelê Kurd her çareya siyasî divê, ya Tirk jî %54 navê. Dîsa tê gotin navgînan ragihandinê dikarin meyla raya giştî biguherînin û bandorê lê bikin.

NÊRÎNEK Êdî zehf xwîn

Izzet Gezgör

Şewaz (uslûp) kesanetiya zimên e. Ziman mejî dide nişan. Pêwendiya di navbera mejî û ziman de her wiha mesafeya şexs û mirovahiyê ye. Qutbûna pêwendiya di navbera zimên û mejî de, ji aliyekî ve windabûna kar û barê mejî, ji aliyekî din ve jî, ji rêderketin û bêkontrolbûna zimên îfade dike. Di rojên dawî de, rêvebirên kadroyên leşkerî û lîderên partiyên dewleta KT'ê ji mirin û xwînê pêştir behsa tu tiştî nakin. Behsa serjêkirin û ji-holekirinên ku êrişên qabileyên hov ên civaka kevnare tînin bîra mirov tê kirin. Her yek ji wan, bi dengê herî bilind diqire û dibêje: "Êdî zehf xwîn".

Vêca terorîzm çi ye?

Wek mafdar hesabandina bêmafadariya mentîqa "Ez bi hêz im" û hewldana bi kotek û zor danpejirandina vî mentîqê ji dema Împaratoriya Romayê ya koledar ve iflas kiriye. Sedema têkçûna DYA'yê li Vietnamê jî ev bû. Ev pêşveçûyîna (çûyîna) rast, tevî rêbergirtina her kesî û her tiştî, hikmê xwe îcra kiriye. Em dibînin ku sovenîzm çavan kor, mejiyên jî kerr dike. Daraz ne li gor berambertiyê (edaletê), li gor kompleksa sistema desthilatdar a ku qet bilind nabe, şêkl distîne. Dema wisa ye, hingê mejî û pî cih diguhezînin. Ji bo veşartina mafdariyê, desthilatdar hewl didin ku dîrok, exlaq (moral) û fezîletê bi hezar qalîkên cur be cur berevajî bikin.

Di vî hewldana berevajîkirina rastiyan de, yê ku xwe bi hêz dihesibînin, plana xeniqandin, serûbinkirin û xwînrijandina geleki ku doza azadiyê dike, danîne pêşiya xwe. Tarûmarbûna mirovahiyê ku di şexsên Kurdan de di nav xwîn û xwêdanê de dimîne; dibe politikaya 70 salên komara Tirkîyeyê. U zor (hêz) îtaet û heta îbadetê wek emir pêşkeşî komara heftê salan dike. Ji bo pêkanîna vî fermanê hewldanên mezin tînin serfikirin. Di şûna rast dîtina rastiya tazî û ji yana Kurdan de, çavê xwe digirin û teoriyên nû diafirînin, gale gal dikin, gelek gotinan li ser demokrasî û hiqûqê serf dikin. Lê talebên ku ji fermanên dîrokên pêk tînin, weke ku tune bin, di ser guhê xwe re diavêjin. Bi berxwedana ku li welatê Kurdan hêşin dibe, navên wek "hêzên derve" datînin. Di politikayên nelê yê li ser înkare avakirî de, israrkirin, encama bêçaretî û pişavtineke pîrr xerab e. Aliyê vî siyasîyê ye ku xwe dide der, di şûna çareyê de birdayîna neçariyê ye. Siyasetvan, rojnamevan û 'zilamên zanistê' yê ketîne şûna leşkerên bin emir, ji tîrsa apoletan ya ku ketiye dilê wan, ji qidankên padişahan zêdetir ji qetliaman re methiyeyan dihonin. Kurd çareser kirinê dixwazin. Dewlet mirinê dide pêş. Cihê zordariya hev ya rûbirû di teraziya dîrokê de; li gor pêşveçûnên xweser û nêrîna yekalî ya mejî nîn e, lê li gor kesê ku daxwaza xwe di demêke berbihev a zarûrî de tîne zimên e. Dîsa di vî pêla dîrokê de, helwesta li hember serwestiya ku bi tehdîtan çêkên nû bersivê dide kesên ku navên xwe û azadiya xwe dixwazin, ger pêwîst be bi egîtiya ku mirinê jî dide ber çav maneyekê îfade dike. Veguherîna mirovahiyê û dîroka ku pratîka wê veguhefîne bi van mînakên liberrabûnê yê muazam tijî ne. Dîrok di demên welê de rûpelên xwe ji liberrabûnê welê birûmet re vedike. Namûsa rewşenbîriyê jî bi dengê bilind ifadekirina rastiye, ji çemberê berrûmetiyê dikare xelas bibe. Di vî dema ku civaka Tirk bi sovenîzmê hatiye çeperkirin de, ev helwest xwedî wateyê mezintir e. Pêvajoya ku em tê de ne naşibe yê berê. Em di niqteyêke pîrr hesastir de ne.

Encam; çareser kirina Kurdan, ne di mentîqa "êdî zehf xwîn" de ye. Çareser kirin, di demêke zûtir de destpêkirina hevdîtinên siyasî ye. Nizanîm we gotinên serokwezîrê Îngîlistanê xwendin an na? Diyar e ku hûn jî Îngîlistanê ne bi hêztir in.

Li Başûr teqînên meçhûl

Dîsa bombe teqiyan

Welat/ Zaxo- Roja 31'ê Cotmeha 1993'yan saet li 3'yê êvarê, li ser rîya di navbera Duhok û Zaxoyê de erebeyêke rêxistina Neteweyên Yekbûyî hate gullebarankirin. Şofêrê siwareya ku lê êriş hate kirin, bi berekên demançeyê birîndar bû. Her wiha saet li 9'ê êvara eynî rojê bombeyek li devê deriyê NY'ê, yek jî li devê deriyê Rêxistina Karisaz û Rêxistina KEO teqiya.

Li gor jêderên asayîşê, ew kesên êriş birine ser siwareyê di siwareyêke rengê sor a Belazur (marqeyêke erebeyan) de bûne. Dîsa her wan kesan eynî rojê saet li 9'an bombe danîbûn ber deriyên

rêxistinên navneteweyî. Ji ber ku li derdora wan saziyan siware tune bûn, teqîna bombeyê zêde zerar çênekir. Tenê çend camên wan saziyan hatin jêr.

Li aliyê din, li gor jêderên Asayîşa Zaxoyê, biryara bicihkirina Kurdên Bakur ên ku koçber bûbûn, hate rawestandî. Weke tê zanîn Parlamentoya Başûr beî bi du hefteyan biryar dabû ku, Kurdên Bakur li nav kampên Ranya û Akre bi cih bikin. Bes ev biryar dawî hate xerakirin. Sedemê bicihneanîna wê biryarê ev bû ku, partiyeke serekî ya Hikûmeta Başûr li hember bicihanîna biryarê derket.

Li Pakîstan

Birçîbûn û mirina Kurdên penaber

Welat / Bonn- Roja 19.9.1993'yan bi vir ve, 10 penaberên Kurd li bajarê Lînherê ketine greva birçîbûnê.

Li bajarê Îslam Abadê 60 penahendeyên Kurd li ber deriyê UNHER'ê mitîng kirin, lê hatin girtin û ketin girtîgehê. Niha li Zindana Aydiyaleyê li bajarê Rawilbendiyê dimînin.

Rewşa penaberên Kurd li welatê Pakîstanê roj bi roj ber bi xerabûnê ve diçe. Ew ên ku ji ber kuştin û îşkenceyên rejîma Sedam

reviyane, jiyana penahendeyî ya wan jî jiyaneke dijwar e, heta niha 7 caran ketine girtîgehê û 29 kes ji wan jî ber birçîbûn û nexweşî, îşkenceyên di zindananê rejîma Pakîstanê de, mirine.

Penaberên Kurd li Pakîstanê, dengê xwe bilind dikin û bangî civaka mirovahî, komeleyên mirovperwer û neteweyên hevgirtî dikin ji bo ku, li rewşa wan binihêrin û çareyekê ji rewşa wan re bibînin.

Rêziman û rastnivîsa Kurdî

Rêziman, ew zanist e ku li elementên zimanekî yên bingehîn wek deng, teşe (form), tewandin, peyvik, hwd. vedikole, wan tesnîf dike, têkiliyên di navbera wan de zelal dike û qaîdeyên bingehîn ên çekirina hevokan tesbît dike. Mirov ji vê ravekirinê têdigihîje ku, rêziman bi giştî li ser qaîdeyên têkildariya elementên zimanekî ava dibe. Rastnivîs, ji qaîdeyên ku di nivîsîna zimanekî de tên bikaranîn pêk tê.

Baran Rizgar

Divê ez di destpêka nivîsa xwe de diyar bikim ku, di vîr de ji "Kurdî" mebesta min "Zaravayê Bakur" ango "Kurmançiya Jorîn" e. Bi gotineke din, ez di vê nivîsê de ne li ser giş zaravayên Kurdî, lê li ser ê Bakur dise-kinim.

Armanca vê nivîsê ya bingehîn ji ravekirina rêziman û rastnivîsa Kurdî bêtir, li ser mînaqêşkirina rêziman û rastnivîsa Kurdî rawestan e. Ji ber vê yekê ez dixwazim ku, bi ravekirina "rêziman" û "rastnivîs"ê dest bi nivîsê bikim. Lewre hin ji me "rêziman" û "rastnivîs"ê wek du tiştên serbixwe dibînin û pîrî caran bêyî ku rêzimanê bidin ber çav, di rastnivîsê de guherînan dixwazin. Ev rîskê bi xwe re dihêne. Carinan mirov dibêje qey, mirov di rastnivîsê de guherînan çêdike, lê haya mirov jê tune ku mirov bi wê kirinê tesîrê li rêzimanê jî dike. Gelo "rêziman" çi ye, "rastnivîs" çi ye û peywendiyên wan çi ne? Ango bi çî awayî pevre (bi hev re) têkildar in?

Rêziman, ew zanist e ku li elementên zimanekî yên bingehîn wek deng, teşe (form), tewandin, peyvik, hwd. vedikole, wan tesnîf dike, têkiliyên di navbera wan de zelal dike û qaîdeyên bingehîn ên çekirina hevokan tesbît dike. Mirov ji vê ravekirinê têdigihîje ku, rêziman bi giştî li ser qaîdeyên têkildariya elementên zimanekî ava dibe.

Rastnivîs, ji qaîdeyên ku di nivîsîna zimanekî de tên bikaranîn pêk tê. Du aliyên wê hene. Nivîsîna peyvikan û nivîsîna hevokan. Ango emê peyvikê bi kîjan tîpan binivîsin? Wek mînak, "Kurdî" bi van tîpan tî nivîsîn: K-u-r-d-î, divê tîp ji hevdu vuda neyên nivîsîn û tîpa pêşîn (K) girdek be. Û emê hevokê çawa binivîsin? Emê kîjan elementên hevokê cuda û kîjan elementên hevokê bi peyvikan re binivîsin? Wek mînak, di hevoka "Em çûne malê" de, elementên me ev in: Em, çûn, mal, ê. Divê "Em" û "çûn" cuda, bes "mal" û "ê" pevre bînin nivîsîn. Gava ku em dibêjin "divê", em qaîde-

yekî rastnivîsa Kurdî tînin zimên.

Vê carê gava ku em li van her du ravekirinan dinîhêrin, em dibînin ku her du qad her çiqas ne eynî bin jî, yek bi yekê ve girêdahî ye û tesîrê li hevdu dikin. Ango "rastnivîs" bi giştî ne serbixwe ye. Lewre ya ku tesnîf dike, rave dike, têkildariyan zelal dike û li gorî wê qaîdeyan derdixe, "rêziman" e. Ew bingeh e û ew tayîn dike. Lê belê restnivîs, her çiqas qaîdeyên xwe yên xweser hene jî, qaîdeyên wê bi rave û tesnîfê rêzimanê ve girêdahî ne. Bêyî ku ew wan bide ber çav, ew nîkane qaîdeyan biafirîne. Wek mînak, me li jor got ku, divê "mal" û "ê" pevre bînin nivîsîn. Hek yek ji me re bibêje, "Çima?" Em bersiva wê tenê dikanin ji rêzimanê derxin. Lewre li gor ravekirina rêzimanê, "ê" paşpirtîkek e ku di tewandina navên "mê" de tî bikaranîn. Ji ber ku ew elementeke tewandinê ye, divê ew bi navê tewandî re be, an na ew nav nayê tewandin û hwd. Diyar e ku rêziman bingeha rastnivîsê ava dike.

MINAQEŞEYÊN LI SER RÊZIMAN Û RASTNIVÎSÊ

Mirov dikane bibêje ku Kurdên Bakur çî hengê dest bi Kurdî nivîsînê kiribin, bi wê re dest bi mînaqêşkirina rêziman û rastnivîsê jî kirine. Di salên 1930' û 1940'an de, Celadet Bedirxan û rewşenbîrên li dora Hawarê kombûyî, li gel elfabeya Kurdî ya ji tîpên Latîni pêkhatî, ji bo zaravayê Bakur (Kurmançî) dest avêtin pêkanîna rêzimanê standard jî. Bi pêşengiya Celadet Bedirxan û beşdariya gelek rewşenbîr û zimanzanan, rêzimanê standard pêk anîn û her wiha di ronahiya vê rêzimanê de qaîdeyên rastnivîsê jî tesbît kirin. Li gel çend kovaran wek Hawar, Roja Nû, Ronahî li ser bingeha alfabe, rêziman û rastnivîsa nû pirtûk jî derketin. Rewşenbîr û nivîskarên Kurd bi giştî ew alfabe, rêziman û rastnivîs peji-randin û ji bo danasîn û di nav Kurdan de belavkirina wan hewl kirin. Her wiha, zanîngêhên welatên Rojava yê ku di nava xwe de beş-


Kurdolojî vekirin jî, ew alfabe, rêziman û rastnivîs bi kar anîn.

Bêguman wan rewşenbîrên hêja, di wan salan de di nav xwe de gelek mînaqêşe kirin û ew alfabe, rêziman û rastnivîs bûn encamên wan mînaqêşeyan. Ji lew re ew bûn alfabe, rêziman û rastnivîsa Kurdî ya standard. Bi gotineke din bûn alfabe, rêziman û rastnivîsa me ya kevneşopî (tradîsyonal). Em dikanin bi hêsanî bibêjin ku rewşenbîr û zimanzanên Kurd ên wê demê, bi ser ketin. Vatîniya xwe ya wê demê bi serbilindî bi cih anîn û pirsên nivîsîn û standardkirina Kurmançî di gaveke pîr baş de radestî (teslîmî) qirnên piştî xwe kirin. Lê mixabin, qirnên piştî wan nedikanî vatîniya xwe bi cih bînin û ji sewiya ku wan hiştiye bigirin û bigihînin sewiyeyeke bilindtir. Sedemên vê pêşve-

Mirov dikane bibêje ku Kurdên Bakur çî hengê dest bi Kurdî nivîsînê kiribin, bi wê re dest bi mînaqêşkirina rêziman û rastnivîsê jî kirine. Di salên 1930 û 1940'an de, Celadet Bedirxan û rewşenbîr, li gel elfabeya Kurdî ya ji tîpên Latîni pêkhatî, ji bo zaravayê Bakur dest avêtin pêkanîna rêzimanê standard jî. Bi pêşengiya Celadet Bedirxan û beşdariya gelek rewşenbîr û zimanzanan ve, rêzimanê standard pêk anîn û her wiha di ronahiya vê rêzimanê de qaîdeyên rastnivîsê jî tesbît kirin.

nexistinê demeke pîr dirêj, bi giranî yê objektîf bûn; lê belê mirov dikane bibêje ku van dozdeh an sêzden salên dawîn, gelek hêlên subjektîf jî bûn sedem. Piştî ku pîrri-nya rewşenbîr û nivîskaran li gel hejmareke mezin xwenda û beşekî gelê Kurd li Ewrûpayê bi cih bûn û dest bi weşanên Kurdî, hînbûn û hînkirina Kurdî, mînaqêşeyên alfabe, rêziman û rastnivîsa Kurdî kirin, rewşeke objektîf ji bo pêşve-ştina rêziman û rastnivîsa Kurdî pêk hat. Heta bi derê jî wê rewşê hat îstîfadekirin û ji tunebûnê xwendin û nivîsîna Kurdî li gel hejmareke ne hindik, weşanên Kurdî di nav Kurdên li Ewrûpayê de belav bû.

Gelek kes li ser alfabe, rêziman û rastnivîsa Kurdî serê xwe êşandin; hin mamosteyên Kurdî çêbûn û heke ne bi awayekî têrkir be jî, hin ferhengên Kurdî ha-



Mamosteyê zimanê Kurdî Baran Rizgar

tin weşandin. Li vir niqteya herî girîng ew bû ku, pîrri-nya kovar, rojname, weşan-xane, mamoste û nivîskaran alfabe, rêziman û rastnivîsa Hawarê wek bingeh peji-randin. Lê belê di demeke kin de, mînaqêşeyên li ser elfabe, rêziman û rastnivîsê jî dest pê kirin. Bêguman, van mînaqêşeyan dikanî bibûna sedema pêşve-ştina alfabe, rêziman û rastnivîsa Kurmançî ya kevneşopî. Lewre wan li ser bingehê pîr xurt û dewlemend dest pê kiribûn. Lê pîr mixabin, pîrî caran sewiyeya mînaqê-

nivîskarên ku ji Tirkiyeyê beşdarî vê mînaqêşeyê bûn, bi xwe re alternatîfên Hawarê jî anîn. Hin ji van alternatîfan, bêyî ku li ser rêziman û rastnivîsa kevneşopî bî kolandin, hatin amadekirin. Bêguman, mînaqêşe pîrtir belav bû. Di serê gelek kesan de, întîbayeke wiha çêbû ku gelek rêzimanên Kurdî hene.

Bi dîtina min, ew qonaxa mînaqêşeyê ji ya 1930'yan gelekî paşvetir e, sewiyeya mînaqêşeyan di bin sewiyeya yê 1930'yan de ye û heke tedbîr neyê standin,

şeyan ji ya yê 1930'yan ne bilindtir bû û heta gelek caran di bin wê de bûn. Bi dîtina min, sedemên vê subjektîf bûn. Lewre wek min li jor jî got, rewşa objektîf ji bo pêşve-ştinê pîr misaît bû. Me dozdeh an sêzdeh salan mînaqêşe kir, ji dîla ku em hin pîrsan çareser bikin, me pîrsa "î,i" û "i,i" afirand. Guherînen ku di rêziman û rastnivîsa Kurdî de hatin kirin, bi pîranî ferdî man û nebûn biryarên giştî.

Gava ku li Tirkiyeyê rîya weşanên Kurdî vebû, meylên siyasî yê li Ewrûpayê çûn li Tirkiyeyê bi awayên xwe yê li Ewrûpayê dest bi weşanan kirin, vî carê kesên li Tirkiyeyê jî bi tesfîrên xwe ketin ser vî û pêvajoyeke nû a mînaqêşeyên li ser alfabe, rêziman û rastnivîsa Kurdî dest pê kirin. Berê jî tunebûnê herkes Hawar wek bingeh, wek destpêkekê dipejirand. Hin

wê mînaqêşe têkevin holeke vala û xesareke mezin bidin zimanê me yê nivîskî. Divê neyê jîbîrkirin ku, mînaqêşe çiqas di hola vala de bimînin û her here qonîk bibin, gel wê ewqas pîr ji zimanê nivîskî dîr bisekine. Heke gel jê dîr bisekine jî, tu qîmeta zimanê nivîskî wê di derdoreke teng de namîne. Vê gavê divê em çî bikin ku, ev mînaqêşe di rîyeke berdâr keve? Divê em ji ku dest bi mînaqêşeyê bikin? Bi kîjan metodan û li ser kîjan babetan mînaqêşe bikin? Bi kurtî tedbîrên me çî ne? Bêguman, bêyî bersivadina van pîrsan û yê wek wan, domandina mînaqêşeyan tu tiştî çareser nake. Ango divê em dîsîplînekê ji mînaqêşeyên xwe re çekin. Ji bo wê jî, ez bi xwe, gavên jêrin pêwîst dibînim:

—Çend rêziman û rastnivîsên Kurmançî hene?

Wê bidome

Yılmaz Güney li Îranê

Anîs

Navê filmçêkerê mezin î Kurd ji bo ronakbîr, karbidest û bînerên elaqedarên sînemaya Îranê navekî nasyar e û gelek kes wî navê pîroz dizanin. Di pirranîya kovarên sînemayê yên Îranê de ji bo nîşandana filmên wî, bi zimanê Farisî gelek tişt hatin nivîsîn ku çavkaniyên wan bêhtir ji Rojava û bi taybetî ji Îngilîz û Fransî bûn.

Heta niha filmên "Yol" (Rê) û "Ağit" (Şin) li sînemayên Îranê hatine nîşandan. Di Festîvala Film a Navneteweyî ya Tehranê (1986-7) de cara pêşîn filmê "Yol" bi zimanê Tirkî hate ravekirin. Di dawîya qedîna film de gelê bîner rabûn ser piyan û nêzikî deqîqeyê jê re li çepikan dan. Piştî re film dūblajê Farisî kirin û bi çend mehan li ser perdeyên sînemayên Tehran û çend bajarên xerî Kurd ên dinê hate nîşandan.

Bi tenê bajarê ku ji bo Kurdan ev film hate nîşandan "Wirmiyê" ku rûniştvanên navenda bajar bêhtir Azerî, bes hejmareke kêr û gundên wê tev Kurd in. Film du car jî di televizyonê de hat nîşandan. "Ağit" (Şin) jî çend meh li salonên sînemayên bajarên mezin û carekê jî di televizyonê de hate weşandin.

Ji we re seyr û ecêb neyê ku bê gotin heta niha tu kovareke Farisî yên li Îranê behsa vê nekiriye Yılmaz Kurd e û yek ji hunermendî xebatkarê Kurd e li Tirkîyeyê. Lê dibêjin ku, ew filmçêkerê serhildêr î Tirk bûye ku, bîr û hizrê anarşizma çepî pê re hebûye û carekê jî karmendekî dewletê bi demançeyê kuştîye.

Tenê kovara Kurdî "Sirweh" (çapa Wirmiyê-Îran) behsa Kurdbûna Yılmaz Güney kiriye. Beriya bi salekê şîrekî wî wergerandin ser zimanê Farisî û di kovareke edebî ya Farisî de belavkirin

Ji we re seyr û ecêb neyê ku bê gotin heta niha tu kovareke Farisî yên li Îranê behsa vê nekiriye Yılmaz Kurd e û yek ji hunermendî xebatkarê Kurd e li Tirkîyeyê. Lê dibêjin ku, ew filmçêkerê serhildêr î Tirk bûye ku, bîr û hizrê anarşizma çepî pê re hebûye û carekê jî karmendekî dewletê bi demançeyê kuştîye.

ku digotin ew ya Yılmaz e. Di salên destpêka "Şoreşa Îslamî" (1978) de pirtûkek ji kurteçîrokên Güney ji bo zarokan bi Farisî hate weşandin, ku wergêr jî digot Yılmaz Tirk e, lê belê rûmeteke taybetî dabûyê û di radeya "Semed Behrengî" de dabû nîşandin. Navê wê pirtûkê ev bû: "Faşizm çi ye? Balinde an jî legleg?" Ev pirtûk bi tîrajeke kêr hate weşandin û carekê din îznê çapkirinê jî bo wê nehate standin.

Ji ber ku di sînema û televizyona Îranê de çarçoveyêke diyar û nediyar a sansora mezhebî, siyasî û civakî heye û her ew tişt e destê hunermendên sînemaya Îranê hişk girê daye, filmên Yılmaz Güney jî ji wê para xwe standin, bi taybetî Yol.

Ji bilî sansora zayendî (cinsî) ku bi lez û hetmî li ser hemû filman dikin û heta filmçêkerên Îranî nikarin jin bi serqotî û miltazî nîşan bidin, an mîr dest bide dest û milê tu keç an pîrekê, em dikarin behsa çend tiştên din jî der barê sansora filmê "Yol" de bikin:

1-Birrîna dîmenê çixarekîşandina zarokan di dūblaja Farisî û nîşandana di televizyonê de.

2-Birrîna dîmenê serşuştina Zînê jina Seyîd, dema ku biryara vegera li gel mîrê xwe daye.

3-Birrîna dîmenê çuyîna kerxaneyê ya yek ji wan girtiyan.

4-Birrîna dîmenê tîkiliya jin û mîr di avdestxaneyê trenê de.

5-Guherîna bi dehan wîşe (peyv) ji

diyalogên film.

6-Mudaxelekirina li muzîk û awazên Kurdî yên di film de.

7-Birrîna dîmenê ku navê "Kurdistan" tê de derbas dibe.

8-Birrîna dîmenê secdekirina karakterê film jî bo axa Kurdistanê.



9-Birrîna dîmenê tîtraja dumahîka film.

10, 11,...

Bi tevahî nêzikî 10-15 deqîqeyî jî film di nîşandana giştî de hatibû birrîn.

Niha ez dixwazim behsa qewmîneke ku raşteqîn e der barê sansora di sînemaya Îranê de bikim û di pey de dawî bi gotara xwe binim:

Filmê Rûsî "Deheng" a ku ji romana Dostoyevskî li Îranê hate nîşandan ku behsa jineke ciwan bi navê "Anastasia" ku gelek mîr pê re dixwazin bizewicin dike. Ji yek naziktirîn beşê film-ew dema ku "Anastasia" dixwaze ji nav mîran yekî ji bo xwe bi awayê şûyê xwe hilbijêre- Anastasia gerdentazî ye û xuya ye, porê wê derketiye û ev gunehê mezin e, nîşandana wê heram e, karbidestên sînemaya Îranê hîleyekê peyde kirin. Ew jî ev e ku, carekê film li ser perdeyê dan nîşandan û hatin ewqas ku ji bo pez (rejîm) zirar çeneke ji film carekê din film hilgirtin kamerayê û xistin cihê eslê film. Ev yek jî zehf deng veda. Guherandina film li Îranê ewqas xwezayî ye ku, dibêjin filmçêker piştî nîşandana film bi xwe jî nikare filmê xwe nas bike.



Yılmaz Güney li Îranê jî leqayî sansorê tê

Folkloriy Mukirîan (Bi zaravayê soranî)

Zorewanî kiçan



Mam Wisû

Le serdemî kon da, lew çax û heyamey le Kurdistanî xomanda hêştî agir be berd û estê heldekran û sîngiy dak û dapîran le raz û awsinan tijî bûn, le wan zemanan da ke radyo û televizyon û dengewere giştîyekan neyantîwanîbû cêge be korî beyt xiwanan û baloreh bêjan lêj biken û qaç dirêj kirdineh bin lêfe kursiy zistan û giwê qulaxî heqayetî "Nene Kalê" û "Da Besê" be xoştîrîn şewçereh dadenra, gemeh û yariyekanîş bon û beramêkiy xomaliyan lêwe dehat û kiç û kuriy ser û pêçke û mîrmindaliy gund û şaroçkekan, pêkewe rojgaryan derbaz dekird. Ewendey be bîriy pîrim dabê, kiçanî Mukirîan dû coreh zorewanîyan hebû ke pêyan degutin: "Texte Texte" û "Çerme Çerme".

Texte Texte: Dû kiç dehatin berew rûy yekdî radewestan û qol û baskî yektiryan degirt û wêray helbez dabêz û şîr xwendineweh

yektiryan heldexuland û her kes hewliy deda ewtîr le erd bida:

Ay texte texte texte
Êwarêkiy bê wexte
Le ser texte darê
girm û horî siwarê
Sela le birîndarê
Birîndariy xomeh
Awî germe şomeh
Helim girt be milaneh
Heta ser qebraneh
Qebrî teng û tareh
Pir le mşk û mareh
Mşk û mar hezyeyeh
kakim le hucrêyeh
kijan çawîan lêyeh
kijiy çaw estêreh
Deng le gel bilwêreh
Bilwêr belalûkeh
Espiy kakim cûkeh
Hênay be xêr bûkeh
Cûte bûkiy mîrî
Hênam be yexsîrî
Yexsîriy qelatê
Alî Beg man gatê
Desrokêk man datê
Desrokey hewriy bê
Le birînim pêçî bê
Birîniy gamêşê
Der û diwar deqelşê

Çerme Çerme: Dû kiç le pena yektir radewestan û qolyan le qoliy yektir dekird û lem haleh da her dû destîyan le pişt milyan girê deda. Ca dîsanîş wêray helbez dabêz û şîr xwendineweh hewliyan deda yektir helxulênin heta ewyake le erdiy biden:

He çerme çerme çerme
çermew dû helalim dî
De gel miso lalim dî
Miso lalî dû girdî
Demhênay û dembirdiy
Le biram mareh dekirdî
Mare mare helbezeh
Be sincaq û be terzeh
Sincaqiy min zêrîneh
De xalanim gêrîneh
Xaliy de qum qumokeh
Qum qumokem kutaweh
De mûsilêm berdaweh
Mûsil berdêkiy xiştêh
Şêr şêrûkey le piştê
Şêr şêrûke mindaleh
Hatewe berew maleh
Qendiy le ser qaqezî
Qadiraxa hat dabêzî
Bo xom bûme çapezî

Civaka karê bi hev re û aboriya hevpişk

Tevgera Heqe (1)

Niwa Hebîb

Bizava Heqe tevgera olî û civakî ye ku di dawiya sala 1920'î de li başûrê Kurdistanê serê xwe hildaye. Hîmdarê vê tevgerê **Şêx Ebdulkerîmê Eskerî** bû ku yek ji şêxên Terîqeta Nexşebendî ye. Ev bizav di nav cotkarên hejar ên deverên **Sûrdaş, Şiwan, Bîtewên** û aliyê **Koyê** de belav bû û civaka jiyana hevbeş, karê bi hev re û aboriya hevpişk (hevpar) di nav xwe de pêk anîn.

Her çiqas ev bizava Heqe di destpêka xwe de li ser hîmê welatparêziyê nehatibû damezirandin ji, lê piştî bandorên (hîkarî) guherînan welêt û yên nav civaka wan; ew ji ketin nav refên niştîmanperwerî û pêşverûyiyê.

Şedele gundekî devera Surdaş e ku, li ser Eyaleta Silêmaniyê ye. Şêx Ebdulkerîm di vî gundî de îrşadê dikir û gelek kes li dora wî kom bûbûn. Mirovekî zana û xwendeyekî mezin bû. Bi zimanê Kurdî, Farisî, Erebi û Tirkî bi xwendin û nivîsînê dizanibû. Her wisa yekî rastgo û pêşverû bû. Pend û şîretên qencî, dostî, hevaltî û alîkariyê li gel dikir. Ji aliyê din ve neyartiya zilm û zorê dikir. Şêx Ebdulkerîm li olê wek tiştêkî derveyî civakê nedinihêrt.

Di wê demê de zilma dere-

Di gundekî bi navê xwe Şedele de ku yek ji gundên başûrê Kurdistanê ye, di çar-yeka yekemîn a vê sedsalê de bizavek di nav hejar û tût û rûtan de serê xwe rakir. Hin şêx û meleyên gelperwer bûn pêşengê vê tevgerê. Civateke karê hevpar û aboriya bi hev re hat danîn û navê wê bû Civata Heqe. Civata Heqe beşdarî bizava Kurdî bûn û di vê riyê de gelek gorî jî pêşkêşî gelê Kurd kirin.

begîti li ser gel zêdetir bûbû. Zilma hikûmetê jî, ji radeyê derketibû. Di nav ew jiyana teng û bêhevî de, gêngeşiyek di nav mele û sofîyan wê deverê de derketibû û digotin ku, dema xuyabûna Mehdî hatiye. Wan rîya çareserkirina pirsgerêk û girftiyên civakî di hatina Mehdî de didîtin ku, di şûna sîtemkariyê de dadiyê (edaletê) bi cih dike.

Ji ber van yekan alîgirên Heqe dev ji rojgirtin û nimêjkirinê berdan û di nav gel de bi navê "bêol" û "Xwedênenas" hatin binavkirin. Ji ber kirin û



Protestoya bi telîs û Şêx Ebdulkerîmê Şedele

rewşa wan î xerab, gel navê dîrîtiyê jî li wan kiribû.

Di nav vî gelê jar û tût û rût de ku li hêviya Mehdî mabûn, dest ji kar û malê berdabûn, jin û mêr bi hev re civîn li dar dixistin û cudahîti jî nav wan rabûbû. Milk, mal û saman kiribûn tevî hev. Mehdî nehat, lê ew karê zibareyî "remekî" pişt re bû bingeha damezrîna civakeke nîvsosyalîst. Şêx Ebdulkerîmê Şedele (1893-1942) pêşengiya vê tevgerê hildabû ser milê xwe.

BÎR Û BAWERİYÊN HEQE

Baweriya civaka Heqe cureyek ji sosyalîzmê bû. Mal û jiyana wan bi awayekî hevpişkî, yekîti û tevahî bûye. Kes bêyî yekî ne malê xwe difirost û ne jî samanê (serwet) xwe. Di jiyana wan de rêveberiyêke demokratîk hebû. Jê re digot: "Pîrs û rayên biratî". Di civînan de gişt beşdar dibûn tevî jin û mêr, dewlemend û jar bêcudahî.

Di nav civaka Heqe de azadiyêke tam a jinan hebû. Keç bi kêfa dilê xwe dergistiyên xwe hildibijartin. Di nav wan de qelen nîn bû. Azadî û serbestiya afret ên (jin) Heqe bû çeka destê neyarên wan.

Di hemû gundên alîgirên Heqe de, tekyayek hebû û berpirsiyarê tekyayê her mehê baca mehane ji en-

damên xwe kom dikir, ji bo mesrefan.

Ji aliyê din ve, mirîdên Heqe gund bi gund ji bo bîr û baweriyên xwe belav bikin, digeriyan. Navê wan "**Birayê Gerîde**" bû. Ji ber ku çoyeke kurt bi xwe re digerandin, di nav gel de bi navê "Heqeyê darequle" jî dihatin naskirin.

Yek ji baweriyên Heqe yê girîng ew bû ku nedixwestin kesekî hejar (xizan) di nava wan de bimîne. Alîkariya hejarên xwe dikirin, hevdu digirtin û ji bo baweriya xwe jiyana xwe feda dikirin. Gelek kes ji wan hatin kuştin, derbeder bûn, ketin bendixanan, lê ji rîya xwe derneketin.

HEQE LI HEMBER HÊZÊN DAGIRKER

Gava ku Şêx Ebdulkerîm li gundê Şedele bi danîna tevgera Heqe mijûl dibû, bizava neteweyî li başûrê welêt serê xwe radikir. Îngilîz dizanibûn ku çî henga fikrên olî ji bilî daxwaziyên kevnepe-restî û paşverûyî, ji bo pirsgerêkên niştîmanî û civakî bê bikaranîn, bandoreke (tesîreke) mezin li ser civakê dike. Ji her kesî bêhtir Îngilîz bi naveroka Heqe û ramana Şêxên Şedele têdighîştin. Lewma Îngilîz gelek difikirîn ku rê li pêşiya mezinbûna ramana Heqe bigirin. Gelek kes şandin cem Şêx Ebdulkerîm. Yek ji wan **Mr. Edmons** e ku Şewir-

mendê Wezîriya Hundirîn a Iraqê bû.

Edmons du caran çû Şedeleyê. Carek bi dizî û carekê jî eşkere. Herdu car jî tekîfa pereyekî mezin li Şêx dike. Lê Şêx napejîne û her rîya xwe dikudîne.

PROTESTOYA BI TELÎS

Tevgera Heqe roj bi roj mezin dibû, heta sala 1934'an Îngilîz Şêx Ebdulkerîm û çend mezinên Heqe girtin û avêtin zîndana **Kerkûkê**. Hin ji wan jî nefiyê Hewîcê kirin. Mirîd û alîgirên Heqe kincên xwe ji xwe kirin û şewitandin. Telîs li xwe kirin û ber bi Kerkûkê ve meşîyan. Li Kerkûkê çûn ber dergêhê rêveberiya rêxistina polis û bi yek dengî gazî dikirin: "Şêx azad bikin, heke hûn Şêx azad nakin me jî bigirin".

Îngilîz hin ji wan jî girtin û avêtin bendixaneyê. Lê ev rewş tesîra xwe li pîraniya gel kir. Îngilîz di dawiyê de neçar man û Şêx û hevalên wî azad kirin.

Şêx Ebdulkerîmê Şedele heta mirina xwe ya di sala 1942'yan de pêwendiyên xwe yên xurt bi serokên Kurd re danîbû. Di şerê bi navê "**Kotel**" de li dijî Îngilîzan aliyê Şêx Mehmûdê Berzencî kirin. Heqe di vî şerî de dev ji cihên xwe bernekan û heqa ku şer kuta bû li hemberî Îngilîz têkoşîyan. **Wê bidome**

KOKA NAVÊ "HEQE"

Alîgirên Heqe ku sofî bûn, her tim di xaneqeyên* Şêx de zikir dikirin û haya wan ji wan nedîma û digotin; "Elah Elah, ya Heq ya Heq". Ji aliyê din ve jî ber ku bi riyên xwe şanaz bûn û her tim peyva "Heq" li ser zimanê wan bû, bû sebeb ku bi navê "Heq" di nav gel de deng bidin.

Gava ku alîgirên Heqe peyveke rast dibîhîstin, an karêkî baş didîtin, digotin: "Heq e".

Ev peyva "Heqe wisa bandor û hîkarî li alîgirên Heqe kiribû ku dengê her tepînekê, repînekê, teqînekê û hwd. diçû guhê wan, ji cihê xwe hildipekiyan û "Heq e" digotin.

Kêfa wan gelek dihat ji ber ku gel navê wan kiribû "Heqe". Pêgirên Heqe digotin: "Em heqperwer in û li heqîqetê digerin. Lewma navê me bûye Heqe".

*Xaneqe: Cihê ku alîgirên Terîqeta Nexşebendî lê dicivin û zikir dikin. Ji cihê kombûn û zikirkirina pêgirên Terîqeta Qadirî re jî "Tekya" tê gotin. Ji mirîdê Terîqeta Neqşebendî re "Sofî", ji yê Terîqeta Qadirî re jî "Derwêş" tê gotin.

Dilovaniya Apê Osman

Nazîf Nasro

Dem dema Kawa, dema Ristem û Qubad, dema serhildanên bi rûmet, Simko, Berzenci, Qadî Muhamed, Şêr Ezdîn, Alî Reda û Şêx Seîdê Kal bû. Niha dem bû dema serxwebûn û azadiya gelê Kurd.

Dem bihurî; gelê Kurd ketibû şeveke reş, dagirker weke cenaweran dest di avêtin keç û xortan, kalepîr û jinan. Gelên Arî Faris û Peştûnan bi soz û peymanên biyaniyan serbilind bûbûn. Tûran û Sefewî her dîn dibûn, lê Kurd bûbûn wek gogeke listikê di nav lepên hewseran de. Lê Kurdistan newestiya, reht nebû, tim û tim lawên hêja û bi rûmet derxistin holê. Mûm û find li ber her kevirekî, an zinarekî vêdiktin, neftên agir her tim rewşenbîrên Kurdistanê bûn. Ew hozan riya Kurdayetî nîşanî gel didan, baweriyên bi zanistî honandî kirin hila xwendin û lêkolînê, pênuşa wan ji gel re bûbû roj û ji hewselên hikumdarên re jî bûbû tîr. Dijminê hov her diçî dijwartir dibû. Fermanên xwe didan xoceyan, cendirmeyan û keyayên gundan. Carina bi rêka biratî û hemwelatî û carina jî bi rêka olî. Ev kafir e, yê din misilman e, yê sisiyan jî şeytanperest e.

Hozanên Kurdistanê, mele û seydayên welêt tevî şêx û pîrên Kurd dev ji Kurdîtiya xwe bernedan û Kurdistan ji xwe re kirin keleha berxwedanê. Hin ji van hozanan seydayê rêber, bavê hozanan Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Babe Rûxî Hemzanî, Feqiyê Teyran û Cegerxwîn bûn.

Apê Osman jî yek ji van hozan, yek ji van birûmetan bû. Xebatên wî di rewşên gelek dijwar de pêk dihatin. Lê

ji gelê Kurd û şagirtên dibistanan re bû rêberêkî bi nîrx. Hema hema Apê Osman serlêdana her kovareke bi Kurdî bi pênuşa xwe dikir. Rojname û kovarên Kurd bi nîrxandina xwe, bi nîrxandina dîroka serhildanên di cihanê de, an jî bi rexneyên xwe yê di cih de dixemilan-


Di salên 1950'yan de li ser xaka Kurdistanê bir û baweriyên komunîstî, an jî sosyalîstî gelek xurt bû, gelek ji hogir û rêzanêrî me tevî vê şopê bûn û ez dikarim bibêjim ku, hefa Stalîn jî ji xwe re kiribûn bav û rêber. Lê Apê Osman, bavê Hoşîn û Hoşeng, li wan vejeriya û

meke reş ê weke wan salan de ku, Kurdên îslam û Kurdên êzîdî li hev nedinihêrtin û hez ji hevdu nedikirin, Apê dilovan bi peyatî sedan kîlometir diçû û têkilî bi zanayên Zerdeştîyan re datanî ji bo yekîtiya gel.

Ger mirov jiyana hozan, nivîskar û şarezayê dîroka Kurd Apê Osman bixwîne, dê mirov bi hêsanî bigihîje ramanêke bi qedr û qîmet, dê sudeke zanistî di warê zanistî de bibîne. Ev e, rehmetiyê Cegerxwîn xwe çiqas li ser dîroka Kurdî westand û ji me re berhemên hêja diyar kirin jî, lê dîsa ramanêke tarî dida ber çavên xortên zana û şagirtên dibistanan. Apê Osman tu carî fen, xwepêş an jî berjewendiyên taybetî nedihanî bira xwe, dema dest diavêt pênuşa xwe, Kurdistan tevî jin û kalepîran, zinar û latan, jîndaran, hepis û zîndanên xwe hemû wek filmeke sinemayê dihatin ber çavên wî, şarezayê dîroka Kurd hêstirên rûyê xwe paqij dikirin û rastiya gel dinivîsand. Ji ber vê yekê jî tehlî û dilsarî kete navbera herdu hozanên leheng, Şêxmûs (Cegerxwîn) û Osman Sebrî

Ez dibînim xortên me bi felsefe û qîr in Hemû dîrî qada şer dipeyivin, diçin, tîr

Di dawiya temenê xwe de axaftina bi serokê Şoreşa Serxwebûnê re dilê mamosteyê hozanan hênik kir. Apê Osman bi dilrehetî û giyanêke xort canê xwe teslîm kir. Bi gotina wî: "Min azadiya Kurd nedit, lê stêrka keş hêdî hêdî ber bi Kurdistanê ve tî." Hezar rehm li te Apê Nemir, bawer bike êşa te li Bakur û Başûr, îşkenceya te di zîndanên Tatan de, li Tedmîr û Şamê ji xortên dewaroy re, sembola azadiyê ye, evîna roja Kawa ye.



Apê Osman piştî jiyaneke tev de bi berxwedan çû ser dilovaniya xwe

din. Mamosteyê hêja di kovara Çiya de, bi helbesta xwe ya bi navê "Lawê gel" wiha dibêje:

Îro dibêjin xortên zana ew tev şiyarin

Ji bo xebata nava welêt tev de li kar in

A rast nabînim wan di nav şopa xebatê de

Kesî ji wan berî neda riya felatê

bi dilekî pola wiha got:

Hinek ji wan aliye çep, hinek jê rast in

Bi vî awayî gel û welat nayên parastin

Rast û çepên wan ramanê ji derve distînin

Wek bav û kalên tîne xapîn, ne dîrbîn in

Ev bû ramana Apê Osman. Di de-

Ji zaneyan re name

'Şoreş wek evînê ye'

Seyîr Çiya

Şevên vî bajarî min ji hev belav dikin. Ew û şev tev porê min spî dikin. Li vir, welatê min-wek xeyaleteke nêz, wek xeyaleke dîr-ji min.

Min nedixwest rastî wê bêm li kuçeyên vî bajarî, li dîrî, li xerîbî... Lê, li geliyê Farqînê... Çavê me bigihîştê hev li rojhilat, li ser axa welat... xwezî. Em herdu jî, li vir wek penahendeyên serserî, bêwar û bêserî. Ji hev dîr û nêzî hev.

Ey zaneyar! Ey zaneyê yar! Xeletiyek heye... Lê ji kî ye? Ji çî ye? Ew bûye êşa mejiyê min, kûr bêderman û sebebê min. Sibê, roj û şev tevî hev... Ez nizanîm...ez nikarim...wek nexweşek, wek tiryakiyek.

.....

Çirokek heye:

Li çiyayê Qaf evîndarek hebûye, navê wî Sîmûrg bûye. Rojên wî li ser guliyên dara gulê derbas bûne. Rojêk teyr hemû civiyane. Gotîne: "Sîmûrg ji me re lazîm e." U bi rê ketine, li pey rêç û xeyalên wî çûne. Lê roj teng, asîman bi ewr bûye. Pirrî wan li nivê rê mane, hinek mirine, hinek vejeriyane.

Bilbil fetiliye: "Ez nikarim werim, gul heye, ew sebeba dilê min e, dirîkên wê bedelê emrê min e." Şalûr gotiye: "Biskên

min ên rengîn hene, wê gur û çeçel rê li min bigirine."

U bilbil loma cuda bûye ji gul, loma nesekiniye awazên şalûr li pişt qefesên dargul.

Teyrên mayî gihîştine Qaf. Lê ne Sîmûrg hebûye, ne darên gulê. Fêr kirine ku, ew her yek bi xwe Sîmûrg bûne. U ew evîn di dilê wan de bûye.

.....
Ma tu zanî kî dinivîse dîrokan, kî dinivîse helbestan...? Ew gotin û çirokên bêeman? Xapandine bengiyan! Tu zanî navê dermanek ji bo xerîbî û evîndariyê?

Lê... welatê min ku niha bûye çoleke beyar û çavên wê delalê mîna neyar, dîsa jî nayê guhertin ne bi şatoyên Versailles'ê û ne jî bi nazdarên Parîsê.

Ez nizanîm kesî birîna xwe bi agir derman kiriye? An jî êşa xwe bi jehrê derbas kiriye? Lê ev çola beyar û çavên neyar...? Wek agir(ek narîn) û wek jehr(ek şîrîn).

Nizanîm ku ez bilûrek bûma, minê bahoza dilê xwe çawa bi zîman xista? An jî tîrê destê şervanek bûma, ew çavên (ne)yar minê çawa derxista?

Niha li ciheke wiha me ku, bi evînê re ne dikarim serî derxim û ne jî dikarim pê serî deynim... ne dikarim bi xerîbiyê û ne jî dikarim bi hêsiyê...

Ez difikirim ku, di vê rewşê de ne maneya gotinan, ne jî maneya stranan heye. Dengê Mihemed Şêxo û melodiyên helbestên wî jî bîfeyde ne.

.....
Carek din jî ez bihatama dinê, şansekî min hebûya ji bo vê, minê bixwesta; cihek bê dengê te, bê bêhna te, bê hebûna te... min ê bixwesta ku, bibûma ewladê mirovên ku navê te nebihîstine, êşa te nekîşandin.

Ne li Cografyaya Helebçe, ne li ber qebra Mem û Zînê. Ne bi dengê îlahiyên Feqî, ne jî bi qêrînen Nabî; "Heyhat ez ji çemên ziwa debas bûmê, çûme".

.....
Ey zaneyar! Zaneyê yar! Tu evîndarên bênav nas dikî? Tu wan ji çavên wan derdixî? Tu ji derdê wan fêr dikî? Ku pirrên wan, ew delalên ku dil didine wan, pirr caran..... ew delal ne layiq in ji bo wan.

.....
'Şoreş wek evînê ye' digot Rosencof; "Wek evînê xebat dixwaze". Lê evîn jî wek şoreşê ye. Zor, zehmet û wek wê buha ye. Evîndar û şoreşger, rêwiyan riyekê ne. Evîndarên şoreşger, ew ên çavagir... Çiyê wan heye; ji xeyala yar, ji hêviya felata welat zêdetir?

Sond

Sond bi geliyê Laleş û Hemrîn û Sîpan û Sefîn
Sond bi Agirî... bi Metîn
Sond bi zozanên li nav hewrên bilind

Bi newalên tevde xwîn
Sond bi van helbest û ristan
Sond bi xwîna pakrewanan

Bi tivingên partîzanan
Bi lehengên girtîxanan
Qehremanên şer dikin ew in

Bi nenûk û bi diranan
Sond bi karwanên şehîdan
Bi wan egîdan

Sond bi Mezlûm
Sond bi Mahsûm
Sond bi germaya Tebaxê

Sond bi rojê
Sond bi axê
Sond bi şîrê dayikên me

Sond bi hêrsê zariyên me
Sond bi Newrozê...bi agir
Sond bi ala sor û zer

Wê welat azad bibe
Dijmin wê ji nav me bêne der

Pirr ne dîr e
Wê bihar berfa zivistanê
Bike ava çeman

Arê Newroz wê bisoje
Konikê derd û xeman
Deşt û Zozan

Gund û Bajar
Têkevin ronahiyê
Miletê Kurd têkeve bin

baskê azadiyê
Pelê deryayê sîtem wê tevde

bişkên
Gemîya me wê veweste
Li peravê şahiyê

Pirr ne dîr e
Bayê azadî li Kurdistanê rabe
Ala rengîn... wê bi serbestî li ba be.

Lehiya Şoreşê bi xurtî
Wê bide ber xwe gemarê
Girtîxane wê bêne xwarê

Bête kuştin "kurmê darê"
Gul hemî wê bibişkivin
Xort û keç

Mêr û jin
Herine govenda mezin
Pirr ne dîr e

Wê Mehabat
Amed û Sêrt û Cizîr
Dest bidin hev

Wê bi hev re bistirin:
"Ey Reqîb her maye qewmê
Kurdzîman."

Bêguman
Wê di dest şoreşgeran de
Ala kesk û sor bilind be

Wê bi milyon bibêjin
"Em Kurd in, namirin"
Pirr ne dîr e

Wê ji nav zozanan roja geş xuya be
Ala rengîn
Wê li ser hepsa
"Diyarbekirê"
li ba be.

Jan Dost

Rewşa başûrê Kurdistanê -2-

Hilberîn bi xebatê zêde dibe

Mirovê ku Başûr nas neke dikare bibêje ku, derfetên wan nîn in. Rast e. Derfetên wan pîrr kêr in. Lê ji bo mirov wan bi dest bixîne, divê gavina biavêje. Li Başûr gavavêtin tune ye. Ger li Başûr politikaya çandiniyê hebe ji bo şertên îroyîn wê gel karibe bi hêsanî xwe têr bike.



Ger xebateke cidî hebe, erdê Başûrê Kurdistanê pîrr bi xêr û ber e

Axa Başûr bi rastî jî ji bo çandiniyê têr û têr bi ber e. Her der avî ye, axa sor e, bi çem û kanî ye. Gelek der mînkirî ne, lê bi xebateke cidî erdên başûrê Kurdistanê yên mînkirî dikarin paqij bibin. Bi vî awayî hemû erd û zeviyên Başûr dikarin bên çandin.

Î.Xort

Di nivîsara hejmara berê de, me qala fikra neteweyî kiribû. Di vê hejmarê de jî em dixwazin bi giranî li ser aboriya başûrê Kurdistanê rawestin.

Di literatura zanistiyê de aborî bingeha jiyana mirovahiyê ye. Her tişt li gor aboriyê. xwe dixê hundirê feslekê, pîvanekê. Rewşa aboriya mirovan çawa be, jiyana mirovan jî wê wilo be. Ger ji aliyê çînî ve mirov di rewşa qada serdest de be, wê jiyana hin bêhtir dewlemend be. Ger mirov di nav qada bindest de be jixwe jiyana wê di nav tunebûnê de be.

Ev hebûn û tunebûn bêtir îrada mirovan be jî, di nîqteyekê de bi hev dikeve ta ku yek yekê winda bike. Se-

demê bihevketinê jî, paşmayîna aboriyê û tîkiliyên hilberînê ne. Ev tîkiliyên hilberînê bi xwe re hem jiyaneke nû û hem jî aboriyêke hin bêhtir pêşketî tîne û mirovahî di nava wê çerxê de didome.

Gava ku em li çerxa jiyana aborî ya başûrê Kurdistanê dinêrin, ev çerx weke ku hatibe rawestandin. Ji ber ku aborî, hilberîn bi xebatê bi pêş dikeve. Xebat, lê xebateke çawa? Gava mirov ne li gorî pergalên xwe bixebite, hilberîna ku mirov dixwaze pêk bîne, pêk nayê û ew ked û xebat beredayî diçe. Aboriya Başûr jî îro di

vê merhaleyê de ye. Polîtîkayeke wan î aboriyê tune ye. Piştî ku ji şer derketine, bê rewşa welêt çawan e, îro jî hîn wilo ye.

Mirovê ku Başûr nas neke dikare bibêje ku, derfetên wan nîn in. Rast e. Derfetên wan pîrr kêr in. Lê ji bo mirov wan bi dest bixîne, divê gavina biavêje. Li Başûr gavavêtin tune ye. Ê di van şertan de jixwe wê aborî li paş bimîne û gel wê tazî û birçî be.

Ger li başûrê Kurdistanê polîtîkayeke çandiniyê bi tenê hebe ji bo şertên îroyîn wê gel karibe bi hêsanî xwe têr bike. Ji ber ku axa

Başûr bi rastî jî ji bo çandiniyê têr û têr bi ber e. Her der avî ye, axa sor e, bêkewir e, bi çem û kanî ye. Gelek der mînkirî ne, lê bi xebateke cidî erdên Başûr yên mînkirî dikarin paqij bibin. Bi vî awayî hemû erd û zeviyên Başûr dikarin bên çandin û ji wan were îstifadekirin. Yanê ji bo ku çandiniyê neyê kirin tu sebeb nîn e. Belê gava ku mirov li vî axê dinêre carina bi kilometreyan ulên berbiroj çandine. Ev gulên berbiroj (çewt fêr nekin) ne ji bo bidestxistina rûn e. Ji bo çerezkirinê ne. Tiştine din jî çandine, belê her malekê

têra xwe çandine. Lê têrî qûtê salê nake. Ji aliyê zad (ceh, genim, garis û hwd.) ve hema hema çandiniyê nîn e. Zad di demeke dirêj de digihîje. Ji ber ku baweriya wan ji pêşeroja wan tune ye, nikarin li benda gihîştina vî zadî bimînin. Tirsana wan di vî demê de bêhtir jî êrişên Sedam in. Dibêjin: "Me axa xwe çand û pê ve ku Sedam êrişî me bike emê çawa bikin?"

Ev keda me wê gişt beredayî biçê." Ji bo Kurdên Başûr bêpolîtîkbûneke weke êşa bêderman heye. Polîtîkaya mirov tune be, dê berhemên mirov jî tune bin. Ger hebin jî wê ji hev bela wela bin. Aborî û polîtîka jî, dê ji hev bela wela be, wê welat jî ji hev bela wela be, weke başûrê Kurdistanê ya îro..

XAÇEPIRS

Amadekar: Rasto Zilanî

Çeperast: 1- Serokê Partiya Sînn Feîn'ê, partiya legal a ÎRA'yê; di wêne de tê dîtin 2-Bi Dimilkî "lawo, kuro!" / Cephe, bere/ Ajanseker Tirkan 3- Nedûr/ Serokê êlê 4- Koçberiya siyasaî 5- Vê salê/Nalîn/ Şêwe, teşe 6-Bi Îngilizî gelek 7- Kesê nezewicî/ Wisa ...newisa 8- Paşnavê General Muhamed Farah ê Somaliyê 9- Endam/ Navekî mêran 10- Werzek, demsalek

Serejêr: 1- Xezîne/ Baneşanek 2- Dijberê "na"yê/ Paşnavê şexsiyekî Kurd ku, navê wî Nuredîn e 3- Bi Dimilkî rojname/ Vexwarina bingehîn 4- Xwarineke Tirkan 5- Hejmarek/ Destûr 6- Bi Tirkî kelî/ Ji leşkeran celebek 7- Manzara/ Hacet 8- Bi Erebî tu (ji bo jinan) / Navê weşanxaneyê Kurdan, li Stenbol 9- Bi Dimilkî ji me 10- Kutik, kuçik/ Lebitîna hewayê 11- Raketin 12- Navê Xwedayekî ji Misira Qedîm

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
1												
2												
3												
4												
5												
6												
7												
8												
9												
10												

BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇUYÎ
Çeperast: 1- Mihemed Arif 2- Ar/ Rik 3- Laleş/ Radan 4- Aso/ Ekil/ Qiç 5- Vezelîn/ Pike 6- Ala/ Ga 7- Hin/ No 8- İn/ Tog 9- Tortore 10- Hîzar/ Gr
Serejêr: 1- Malavahî 2- Irase/Intî 3-Lozan/ Oz 4- Ehe/ El/ Êra 5- Meşalan/ Tr 6- Ew/ Kî/ Oto 7- Daring/ Org 8- Aral/ Avger 10- Iraqî 11- Finik 12- Ce

QERTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:
 Paşnav:
 Navnîşan:
Bedelê abonetiye razînin:
Li derve: Mazhar Günbat
 İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095
 Döviz tevdiat Hesap No: 3138437
Li Tirkîyê: Mazhar Günbat
 İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095
 Hesap No: 0408342
 Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevî kopyeke pelê razandina bedelê abonetiye bişinin.
Navnîşana Welat: Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul
 Tel: 513 34 33 Fax (Tel): 511 50 07

Mercên abonetiye:

	Li hundir	Li derve
3 meh	60.000	30 DM
6 meh	120.000	60 DM
12 meh	240.000	120 DM

Mirîşka newêrek a nukil sor

Xuyanake li derdor
Ew mirîşka nûkil sor

Lew gelek bêzirav e
Newêrek û dil xav e

Lê ew çibke ev zirav
Standiye ji dê û bav

Heta ku çîçik bû ew
Bi wan çîrokên derew

Diya wê ew dixapand
Di binisan di tirsand

Her şev digot: "Keça
min
Tu guhê xwe bide min

Ew dijminê me kî ne?
Mar û teyr û rovî ne

Li nava giya û pûş
mardikine xuş e xuş

Teyr li hewa di firin
Bi pirtik û bi per in


Rovî guh bel poz tûj
in
Duv dirêj, simbêl şûjin

Ku xuşe xuşek were
Sîyek ser te re here

Bizanibe an mar e
an jî ew teyrê har e

Lê ku ne teyr û mar
be
Ger roviyê bê ar be

Cihê xwe bik guhêze
xwe ji wan bi parêze



Êdî ez bi qewet im
Ji dijmin bê minet im

Demek xweş bûrî li
wan
Çîçik tev bûne zîxan

Şevêkê bûye dereng
Kete guhê kurkê deng

Ji xwe re got: "Hinek
in
Li derî di xebitin

Derî vekin nêriya
Got: "Wey li min rovi
ye!"

Xwe piz kir û da qîja
Agir ji çavan rêja

Baskên xwe li hevdu
dan
Hawîr kir toz û dûxan

Rovî li cih şiliya
Qerem hew lê gerîya

Mirîşk wek teyrê sîmir
Xwe di çavên wî wer
kir

Xwe avêt stûyê rovi
Nukil daran çavê wî

Sîxan li ser kom kirin
Herdu çav lê kor kirin

Mirîşkê bi zirt û fort
Ji çîçikên xwe re got:

"Heta ku tirs hebêtin
Tu car nabe serkeftin"

Jîr DILOVAN

Êdî her tim bi pirs be
Ji siya xwe bi tirs be"

Heta ku ew bû sîxan
Jiyan li wê bu zîndan

Ku xişpênêk bi hata
Ziravên wê diqeta

Mîna li ser agir bû
Dê li ku ba, li wir bû

Lê niha dê tune ye
Êdî bi serê xwe ye

Ji hêkan dagirt hêlîn
Bû kurk Çêlî deranîn

Çîçik derandin ji lîs
Hemû wek gulokên
rîs

Li hewşê kire qit qit
Tiştêkî li dû go "pit!"

Nizanibû bê çî ye.
Li dû xwe ne nêriya

Qij qij kir û li xwe da
Ber bi lîsê xwe bazda

Çîçikan bi çîre wîr
Tev belav bûn li hawîr

Çîçikek ji wan nêrî
Got: "Yadê xwelî serî

Ne tirse va kulîyek
Ezê bikim parîyek

Çîçikê kulyê neçar

Kire parîyek û xwar

Mirîşkê pîrr fedî kir
Bi gilî û bi nîfir

Got: "Mîna we bav û
dê

Xwedê bi kesî nedê

We ez bê zirav kirim
Bê esil bê nav kirim

Çîçika min ya zelût
Ez kirime mîna hût

Tirsa dilê min şikest
Sermin rabû xof û
pest

Çivîk û gustilka xwe ya delal

Hebû nebû çivîkek
hebû. Çivîka min û we
digere, digere ji xwe re li
erdê gustîlekê dibîne.
Çivîk radibe gustîlka
xwe di bin kevîrê de
vedîşêre û jê re dibê-
je: "Gustîlikê, ez niha di-
çim li derekê karekî min
heye, berî bibe êvar ezê
vegerim. Lê haya te ji te
hebe heta ez bêm, tu
nedewixî! " Û diçe.
Gustîlik got: "Baş e.

Berî bibe êvar çivîk
rabû hat lê nihêrt ku
gustîlik dewixiye! Çivîk
bi xemgînî ji gustîlkê pir-

sî got: "Gustîlik tu çima
dewixî?"

Gustîlikê got: "Çima gi-
ya li bin min hêşîn dibel!"

Çivîkê got: "Giya tu çî-
ma li bin gustîlkê hêşîn
dibî?"

Giya got: "Çima pez
min dixwe!"

Çivîkê got: "Pez çima
tu giya dixwî?"

Pez got: "Çima gur
min dixwe!"

Çivîkê got: "Gur tu çî-
ma pez dixwî?"

Gur got: "Çima kûçik
dibêje hewt hewt hewt!"

Çivîkê got: "Kûçik çima

tu dibêjî hewt hewt
hewt?"

Kûçikê got: "Çima pî-
rejin nan nade min!"


Çivîkê got: "Pîrejinê çî-
ma tu nan nadî kûçik?"

Pîrejinê got: "Çima
mişk arê min dixwe!"

Çivîkê got: "Mişko çî-
ma tu arê pîrejinê dix-
wî?"

Mişko got:
Dixwim dixwim
Çavê min peq e
Qemça min req e
Guhê min tebeq e!

Berhevkar: Niwa Hebîb



Mirov bi zimanê xwe qenc hîn dibe

Zana Farqînî

B. A. Nîcolas an jî bi ya wî ku jî xwe re digot "Yanî bi Kurmancî Endrawis", pîrr nefsbîçûk û nazik jî bo wergerîna Încilê li zaravayê Kurmancî dixebite. Mîrza Endrawis, bi Kurmanciyê xweş î herêma Toran diaxive, jî ber ku li Almanyayê di gel Toriyana hînî zimên bûye. Ji aliyê din ve oldar (dîndar) e, bi helwesteke rahîbî nêzîkahî li mirov dikir. Zimanêkî şîrînî lihû (lûs) di dev de bû, mû li zimanê wî nedigeriya gava ku bi mirov re dipeyivî. Ji pispor û hostayê wergeriyê bêhtir bi axaftin û şêla xwe didirûvî (dişîbiya) derwêşekî filehî ku, jî bo belavkirina ola filehî, bawerîya bi Xwedê, bicihkirina fikr û hînkirinên Îsa Mesîh, di gel "nepakiyê" bicihkirina "qenciye" û hwd. têdikoşe. Giramgir bû, zarxweş û devliken bû. Bi van taybetiyên xwe, tevdan û helwestên xwe, xwe bi mirov dida hezîkirin.

Lewma dema me xwest em pê re sohbetekê bikin, rewşa wî, şêla wî ya oldarî kir ku em serê pêşîn jê pîrsa ka çî hengê dest bi belavkirina raman û hînkirinên Îsa Mesîh kiriyê, bikin.

Endrawis jî malbateke filehê ku filehiyî bi ser re dijî, tê. Hîn di 13 saliya xwe de bi nakokî û mixrikiyên di dav ciwakê de werdiqele. Ev rewş wî bi ser xwe ve dikişîn û di kin ku serê xwe li ser wan bişîne. Dikeve pey binikê wan, dixwazê eger û pêkerên wan bizanibe. Ne bi tenê rewşa li Amerîkayê, ya Rûsyayê jî her jê re dibe meraq ku pê dadikeve. Wiha dibêje: **"Ez bi xwe jî welatekî zengîn û bi qewet im. Wê hengê di dinyayê de Rûsya û Amerîka hebûn. Min dit ku tiştên nerast li Amerîkayê jî hene. Însanên dinyayê hemû gunehkar in. Min jî xwe re got: "Ez dixwazim Xwedê nas bikim, rastiya Xwedê nas bikim."**

Pirsariyên wî yên bi vî rengî wî ber bi xwendina Încilê ve dibin. Îsa Mesîh nas dike, bes Încilê bi Îngilîzî dilê wî rihet nake û qîma xwe pê nayne. Biryara xwe dide ku zimanî Îsa, zimanê Încilê û Tewratê hîn bibe. Ji destê yekemîn, jî kana yekemîn hînkirina Îsa Mesîh e "rizgarker" bihewise (hîn bibe). Heta bawerîya xwe bi kesên jî xwe re dibêjin, "Em şagirtên Îsa me-

sîh in" nayne.

Li Zanistgehê çar sal li ser zimanê Yewnaniya Kevin û İbrani diwxîne. Nasîya wî bi zimanên din re jî çêdibe. Pê dihesse ku li dinyayê jî şeş hezarî bêhtir ziman hene, tevî zaravayên wan. Bes sê-çar hezar ziman bi tenê tene nîvisîn. Ka jî vê pê ve em dorê bidine wî: **"Min dit ku hin enstîtu û civat hene alîkariya zimanên biçûk û mîletên biçûk dikin. Ji bo hînbûna ziman û jî bo nivîsandinê ziman, jî bo tercûmekirina Încil û tewratê."**

Em jî hîn dibin ku, ew jî beşdarî van xebatan dibe. Li Amerîkayê, li enstîtuyekê du sal li ser vekolîna zimên dixwîne. Hin zimanên dewlemend dêhna wî bi ser xwe ve

ka xwe re bi Kurmancî hîn dibin. Berî bi şeş salan dest bi hewisîna zimên dikin. Armanca xwe jî bi vê şeweyê diyar dike: **"Ji bo hînbûn û vekolîna ziman ez ketim vî şixulî. Bi rastî zimanekî gelek dewlemend e. Bila zarokên Kurmancî zimanê xwe jî bîr nekin. zimanê dê û bavê xwe hîn bibin. Ji ber ku, ev tiştêkî pîrr qenc e."** Diyarkirinên wî yên bi vî rengî her didomîyan.

Em li ser pest, pêkutî, qedexê û parîkirina welêt jî pê re peyivîn, mijûl bûn. Di gel hemû merc (şert) ên neyînî me jê pîrsî ka rewşa zaravayê Kurmancî çawa ditiye û dibîne. Ji pîrsa me re **"Eger em zimanê Kurmancî li**

Kurtejiyan

B. A. Nîcolas li Amerîkayê, li Kaliforniyayê beriya bi 33 salan hatiye dinyayê. Li wir heta zanistgehê xwendina xwe kuta kiriyê û pişt re çar sal zimanê Yewnaniya Kevin û İbrani xwendiyê. Nîcolas di warê wergeriyê de pispor e, wergeriya pirtûkên olî wek Încil û Tewratê. Ji bilî Kurmancî, İbrani, Yewnaniya Kevin, Aramî, Îngilîzî, Fransî, Spanî û Almanî dizane.



ye. Bi alîkariya hevalekî wî hay û agahiya wî jî gelê Kurd çêdibe. Dibêje ku li Amerîkayê rojnameyên li ser Rojhilat dinivîsîn û nûçeyan belav dikin hene. Bes wî ew rojname nexwendine.

Jixwe di destpêka hevpeyvîna me de xuyiya ku bi siyasetê danakeve û her wiha xwe jê dûr dikir. Di ser û binê axaftina xwe de em bi têkiliya xwe ya bi zimên re dihesand, digot: **"Em li ser zimanan dixebitin. Ziman jî me re wek zêr in. Çimkî her ziman dikarin tiştêkî jî hev hîn bibin. Mesela her ziman li gorî îdyom (biwêj) a xwe diçe. Li gorî xebardana wan, îdyomên wan hene. Ji bo zanebûna ziman ev tişt gelek girîng e."**

Bûye wek toreyekê (adetekê) di dawîya axaftinê de mesajek an jî gotina dawî tê xwestin. Me jî wisa kir û jê xwest. Endrawis **"Hêviya me ew e ku Kurmancî bi şarazî, bi aqil bi ser bikevin. Bi zanebûn, bi xwendinê û bi parastina ziman kes bi pêş ve diçin. Eger kes nikaribe bi zimanê dê û bavê xwe bixwîne, ew kes li paş dimîne. Nikare qenc hîn bibe, çî rê rast e çî rê çewt e. Ji ber vê yekê hêviya me ew e ku hemû Kurmancî zimanê xwe hîn bibin, zimanê xwe biparêzin"** digote me.

Gotinên wî yên dawî yên li ser zimên bi çavekî zanistî ku lê were nihêrtin bi rastî gelek tiştên seyr (ecêb) derdikevin. Girîngiya hêvotînê (perwerdeyê) ya zimanê zikmakî (maderî) vedibêje me. Hêvotina bi zimanê zikmakî li gorî bi zimanekî biyan, jixwe qet nikare bê nîrxandin. Bi xwe ez lînerîneke yekî Amerîkayî ya li ser zimên girîng dibînim û divê were dîtin jî.



B.A Nîcolas di civîna Lijneya wergerê ya Încilê de (kesê sêyemîn) tê dîtin

dikişînin ku ferheng û rêzimanên wan nîn in. Endrawis li hemberî helwesta ku, "Zimanên biçûk ne ziman in û ne hêjayî nivîsandinê ne" derdikeve û lînerîna xwe wiha derdibirîne: **"Xwedê hemû dinyayê, her mîlet û her ziman afirandine. Li ba Xwedê hemû yek in. Em nikarin bibêjin ku yek jî yekî din çetir e."**

Em bi daxuyanîyên wî di hewisîna ku çî pêker (faktor) ew ajotîne vê riyê. Lê, gelo çî jê re bûye navgîn û sebeb ku, zaravayê Kurmancî hîn bibe an jî bi çî awayî bi gelê Kurd û zimanê wî hesiyaye?

Li ser devê wî, bi alîkariya hevalekî xwe bi Kurdan dihesse. Li Almanyayê bi Kurdan re dikeve tîkiliyê û tevî pîre-

hemberî zimanê Çînî, Îngilîzî, Almanî, Fransî, Spanî bikin, ne zimanekî mezin e. Lê eger em zimanê Kurmancî yanî Kurdî- ez behsa Kurdî dikim tevî Soranî, Hewramî, Zazakî û yên din li hemberî zimanê Norvecî û Swêdî ne zimanekî biçûk e. Bi rastî wek ku, di nav zimanan de di navokê de be." ev bersiv da me.

Her wiha didomand ku zimanê Kurdî ne zimanekî biçûk e û "Li gorî hin kesan 20 milyon, hin dibêjin 30 milyon, hin jî dibêjin ku 50 milyon (ez bi xwe nizanîm) kes pê xeber didin e."

Li hember bersiva wî ya ku, mezinbûn an jî biçûkbûna

in. Ango biçûkbûn an jî mezinbûna zimên bi hejmara kesên ku, pê dipeyivin girê neda û li ser zaravayê Kurmancî nîrxandinên xwe wiha didomand: **"Kurmancî gelek zengîn e. Ez jî bo kurmancî dibêjim, ne jî bo soranî. Mesela dibêjin: "Ez hatim, min çixare kişand." Nabêjin: "Ez çixareyê kişandim."** Çênabe, jî ber ku çewt e. Li gorî zimanzanan, Kurmancî zimanekî ergatîf e. Yanî maneya wê, rewşa nav tê guhertin. Mesela lêkerên derbasok û nederbasok hene." Digote ku ne bi tenê Kurmancî heta jî vî aliyê ve Dimilî (Zazakî) jî dewlemend û zengîn e.

Beriya ku zaravayê Kurmancî hîn bibe, der mafê gelê Kurd de tu tişt nizanibû-



- Li ser navê ÎMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
- Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navnîşan (Adres) Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul • Tel: 513 34 33 Tel (fax) 511 50 07
- Berpirsiyariya Ewrûpa • Postfach: 1531, 53117 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 (Navbera saet 11.00-16.00)
- Fax: (49) 228-630715
- Çapkirin (Baskı) Yeni Asya Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım) Birleşik Basın Dağıtım AŞ.